




# OROJA NÛ

*kovara huneri çandi û edebi*



32  
1991

## NAVEROK

Jî Xwendevanan .....	3
Lî Ser Şêx Said- Baran .....	4
Helbest- A. Gernas .....	6
Kara Dizka Qatix- Seidê İbo .....	7
Şîera Kurdi ya Klasik, Sofiti û	
Mewlewi- A. Gernas .....	10
Meqamê Dawetê- Selma Lagerlöf .....	14
Destana Memê Alan û	
"Şanoya Mem û Zin"- Biro Bîlîndci .....	16
Konferansa Navnetewi ya Kurd li	
Bonnê - N. Koçer.....	19
Jî Zargotina Me - Stranên	
Serhildana Agiri I-A. Bazidi .....	22
Deranîn- B. Zinar .....	25
BerevokaTerman.....	27
Quncıkê Zarokan .....	28
Weşanên Nû .....	30

Sal: 13

Hejmar: 75, Çırıya Paşin 1991

ISSN 0283-5355

**KWEDİ:** KOMKAR-Swêd

**BERPIRSİYAR:** Şêroyê BOTAN

**NAVNIŞAN:** Gustavslundsv.168,1 tr  
161 36 STOCKHOLM

**TELEFON :** 08/ 26 23 75

**HESAP NO:** PG. 458980 - 0

**UTGIVARE:** Svensk Kurdiska

Arbetarföreningen

**ANSVARIG UTGIVARE:** Ş. BOTAN

**ADRESS:** Gustavslundv. 168, 1 tr.

161 36 STOCKHOLM

**FAX:** 08/ 26 23 75

# Jî xwendevanan

Redaksiyona kovara Roja Nû,  
Hevalen hêja û delal! Silavên germ jî bo  
we. Ez xorkeki Kurd im û li Sovyetê dîxwinim. Min çend caran kovara we li nik  
hevalan dit û bî rasti kîsa min gelek jî kovara we ra hat. Daxwaziya min ew e ku,  
hûn bo min hejmarêñ nû rêkin û her car  
berdewam bikin. Û dî dumahikê da dibê  
jim, silavên min ên şoresseri bo we.

Hevalê we yê nû  
**Kawa Sulêman**

Silav "Roja Nû",

Eva çend sal e, ez kovara "Roja Nû"  
dîstînim û bî hewaskariyeke mezin  
dixwinim. Kurti bêjim, ev kovar bo min  
gelek eziz e! Nîvisarêñ we yên reng bi  
reng, pîrsêñ wê pêşda kişandi jî kûraya  
dîlê meriv xeber dide. Bî vê yekêra  
girêdayî gerekê bêjim ku, ziman û zara  
vayêñ kovarê dewlemend e.

Redaksiyona delal, ev idî nêziki saleki  
ye, weki li bajarê Bakûyê Merkeza  
Çanda Kurda hatîye sazkirinê. Em  
hazîr dibin, weki sala nû rojnama bî  
navê "Rengê Kurd" neşîr bikin. Em jî we  
alikariyê dixwazin.

Lî bajarê Bakûyê pirtûka min a sisîya  
hatîye weşandinê, ez vê pirtûkê jî we ra  
dişinim.

Ez bê sebir hêviya alikariya we me. Bî  
silavên şirin.

**Ahmedê Hepo-Bakû**

Listikeke keçen koçeran:

## HAÇİÇKO

Jî Roja Nû ra:

Dî vê nameyê da ez dixwazîm lis  
tikeke keçen koçeran bîdim nas  
kirin. Hêvidar im, hûn ji weşandina  
wê kîrhati bibinin. Carek din ji ezê  
listikeke lawan bîdim naskirin.  
Biminin dî xweşiyê da.

Listika Haçîçko, li ser pêçiyêñ pê û bî  
xwehilavêtinê, digel straneki û bêmuzik tê  
listin. Ev listik ji ali keçen koçer va tê  
listin û ji ali hunera dansê va xwedi iddia  
ye. Lewra keçen koçer, dî vê listikê da jiy-

an, daxwazi û hesten xwe dîdin xuyan û li  
ser xwe dilizin.

Dî listikê da keça ku bî ser keve, hevrika  
xwe jî birayê xwe ra tine. Jî ber vê yekê  
listikek him gelek balkêş e him ji bî xeter  
e. Dî dema iroyin da tenê wek listik heye,  
ango naveroka wê ya kevneşopi hatîye  
avêtin.

Ez û xwenga xwe Şariban, bî keçen cira  
nîn me ra gelek caran vê listikê dilistin.  
Ez dixwazîm li vê derê behsa rewşa psi  
kolojik a listikê bîkim. Gava évar dibû, em  
tev jî konan derdiketin, li cihê listikê li hev  
dicivîyan û dest bî listikê dikirin. Xwişk û  
birayêñ listika Haçîçko hanhanka ciyê  
xwe dîgirtin. Dî vê listikê da keçen  
listikvan digel piştgiriya birayêñ xwe yên  
helal dikevin lecê. Keçen Haçîçko li hem  
ber hev cihê xwe dîgrin. Birayêñ wan jî li  
rexê wan ên rastê dîsekinin. Herdu ali ji li  
nava çavêñ hev dînhîrin û bî hêviya ser  
ketinê jî hev ra meydan dixwinin. Tema  
şevan, listikvanan dixin nava daireki û bî  
ışareta destpêkirinê tê dayin.

Keçen Haçîçko bî ışareta destpêka  
listikê ra li ser pêçiyêñ xwe dikevin reqsê.  
Listik li gor tempoya strana Haçîçko gu  
hêrbar e. Figurên listikê ji her wisa li gor  
tempoya stranê guhêrbar û rengin in. Dî  
listikê da li ser pêçiyen xwehilavêtin bê  
navbir dom dike û pê ra ji, listikvan desten  
xwe yek li pêş yek li paş li hev dixin.  
Şerteki dinê ji ew e ku, keçen listikvan tevi  
listikê strana Haçîçko bîxwinin. Bendek ji  
strana haçîçko weha ye:

**"Haçîçko binya kuçko  
Zêr û zivê te dîqetinum  
Te ji bırakê xwe ra tinum."**

Listik, heta ku yek ji listikvanan biweste  
berdewam dike. Ya ku biweste listikê  
winda dike. Keça ku dî listika bî lec da bî  
ser dikeve, wek gladyatora ku dî meydana  
şer da bî ser keve bî şahi çavêñ xwe li  
hawîrdor digerine. Lewra keça serketi jî bo  
birayê xwe dikeve vê listikê da ku keça  
hevrik a binketi jî birayê xwe ra bine. Û  
gava keça serketi radike milê keça binketi  
û dîbe rex birayê xwe, ev didem, li zora  
bîra û pismamîn keça binketi diçê û piri  
caran dî navbera herdu beren listikê da  
şer dîqewime. Jî ber vê yekê ji, ev listik di  
dema iroyin da zêde nayê listin.

**İsayê İskan  
Tatwan**

# LI SER ŞÊX SAİD

BARAN

Ev kaside û du kîlamên jêrin li ser Şêx Said, piştî serhildana 1925 hatine gotin û nîvisin. Me ew ji raporeke resmi ya dewleta Türk girt. Ev rapor bi destê Hasip Koylan hatiye nîvisin. Wi, ev rapor ji ber daxwaza wezirên Turkiyê yên karên hundiri bi navê Hilmi Uran û Şükrû Sökmensuer, di navbera salên 1940-46 hazır kîriye. Bi daktilo hatiye nîvisandin, 419 rûpelê mezin e. Xuyaye ku ev ji bo giregirêne dewletê hatiye çekirin; dibe ku qasi 50-100 hebi hatiye zêdekirin û weki din veşarti maye.

Hasip Koylan wexta ev rapor hazır kîriye, sermufettiş bûye (beri wê ji li Gridaxê wali bûye), bona vê yekê, ji bo hazirkırına vê raporê kariye bigihije çavkaniyêne dewletê yên veşarti. Gelek malûmatiyêne (agahdariyêne) ku di vê raporê da hene li ciyê dinê nayêne ditin. Anglo ev rapor lêkolineke fireh e li ser behsa Serhildana Şêx Said. Herçiqas bi destê memûreki dewletê hatiye nîvisandin ji, ji ber ku ne ji bo derva ye, bo hukumet û giregirêne dewletê ye, gelek tişt eşkere hatine nîvisandin. Anglo ew, bi gotineke din, raya dewletê ya rasti ye li ser pîrsa Kurdi. Û di wê da tê gotin ku, serhildana 1925 serhildaneke milli ye, ji bo avakırına Kurdistaneye serbixwe ye. Hin beş û delilên vê raporê di sala dawi da bi destê Nesimi Fıratlı di kovara Deng da hat belav kîrin (1). Eger ev rapor bi temami û rojki berê çap be, gelek çêtir e. Bo min mecal tune û hêvi dikim ku nîviskar û zanayêne Kurd vi kari di demeke nêzik da safi bikin. Ez li jêr behsa wê kasideyê û herdu kîlaman dikim ku di derheqa şehidê mezin Şêx Said da hatine nîvisandin û gotin.

Nîviskarê raporê ev kaside û kîlamên ku bi Kurmanci hatine gotin, tevi Turkiya wan nîvisandiye û weki din li ser wan tiştek ne gotiye. Anglo li ku derê, ji aliyê kî hatine gotin ne xuya ye. Ez li vir tenê Kurdiya wan dînîvisim. Lê min, her yek ji wan dû car nîvisi: Yekemin car, weki di raporê da hatine nîvisandin, usa ku, herçi bîxwazin lê binêrin û

li ser bifikirin. Lê, ji ber ku mufettişê Türk bi Kurdi nîzane, di nîvisandina wi da gelek xeleti hene. Ji ber vê yekê, bo ku xwendekar çêtir jê fêm bikin, min ev kîlam gor alfabe Kurdi car din nîvisi.

## Kîlama Yekem (Şîklê esli)

Ağa o lo.. Ezi çûme şehri Diyarbekiri taviya berfi berani dü hoşşan.

Destê çiyeck ji babi Ali Haydaran lite ser terziya di nukişan.

Ağa o, tü neke li habera Hacı Hamdi Begi rumi beke sey babi Rumiya bibahtin, te bi vine şehri Diyarbekiri vi dar de ke.

Ağa o, lo miro.. ezi çûme şehri Diyarbekiri, deri dükkani van terziya.

Fermani babi Ali Haydar beke Şemsettin avitine ustiya..

Ağa o, tü neke bi haberi hacı Hamit Begi rumi neke, say babi rumiya bibahtin tebe herne şehri Diyarbekiri bi darda ke ağa o lo miro..

Ezi çûme şehri Diyarbekiri serkahni cûte zabiti rumi vi kûri keri li pişî sakini ji pisira vetke nişanı Hamidi.

Ağa o, tü neke li habera Hacı Hamdi begi rumi neke.. Say babi rumiya bibahtin, vi te behere şehri Diyarbekiri li dar da ke.

## Kîlama Yekem (Bî şîklê rastkiri)

Axao, lo! Ezê çûme şehrê Diyarbekrê, taviya berf û baranê dîxuşuşand;

Destek cil ji bavê Eli Heyder ra li te, ser terziya dîneqışand.

Axao, tu nebi bi xebera Heci Hemdi Begê romi biki, segbavê romiya bêbext in, wê te bîbe şehrê Diyarbekirê, wir dardake.

Axao, lo miro.. Ezê çûme şehrê Diyarbekirê, derê dikanê wan terziya;

Fermana bavê Eli Heyder, kekê Şemseddin avêtine stûya..



Axao, tu nebi bî xebera Heci Hemid Begê romi biki, segbavê romiya bêbext in, wê te bibe şehrê Diyarbekirê bî dardake; axao, lo miro!

Ezê çûme şehrê Diyarbekirê, ser kani, cotek zabitê romi, wi kurê kerê lî pişt sekini, ji pêsi-re vedike nişanê Hemidi.

Axao, tu nebi bî xebera Heci Hemdi Begê romi biki, segbavê romiya bêbext in, wê te bibe şehrê Diyarbekirê bî dardake.

#### Kîlama Duduyan (Bî şîklê esli) "4" Kîlama Şêx Sait - "Beşê Yekem" (\*)

Heyvi heyvi.. hasreti gute kudreti. Tu rabe li dari mali nihie vi delaleti.

Sad miri me kuştin, dü sad miri me birne kela Malazgiri ber şavuti. Heyvi heyvi.. Ezi heta hoş bim li daraduni, dengi derdi babi Ali Riza di dili min dernayi.

Hasreti kut kudreti. Vi subi dili bir kine kine, tırsa buvi tırsiye askeri Cumhuriyeti girane, pişya hesiri hududi İrani vegerine.

Ezi hatta hoş bim li dariduni derdê babi şeyh Ali Riza jî dili min deryani.

#### Kîlama Duduyan (Bî şîklê rastkiri)

Heyf heyf!. Hesretê gote Qudretê: Tu rabe li deri malê binihêre, vê delaletê;

Sed mîrê me kuştin, du sed mîrê me birne Kela Melazgirê, ber şewatê. Heyf heyf! Ezê heta

xweş bim li darê dinê, dengê bavê Ali Riza ji dilê min dernayê.

Hesret gote Qudretê. Vê sibê dili pir kine kin e, tırsa bî wi tırsi ye, eskerê Cumhuriyetê giran e, pêşixa hêşirê hudûdê Iranê vegerine.

Ezê heta xweş bim li darê dinê, derdê bavê Şêx Eli Riza ji dilê min dernayê.

#### Qesideyek ku bo Şêx Said tê gotun (Kurdi) (Bî şîklê esli)

Ey cihanda di cihanda tekiri  
Buya çandi nif alem yayda teziya sed müsteri Hazreti sani mükemmel vehübe ebbi Şeyh Ali Bu fedai kavli Ahmet sed veli bûn müsteri Vakti idamî ifadan şengü şah  
Di hitama mahkemeyda ehli cennet mübşeri Ji nüktei keşfi vilayet mahire  
Kuvvetavi ci di zanu sed mielai meşarı Ji amimen vaktübi zulmen şehida  
Ev merakibi hesaban lev be Ahmetra maan  
Di vira terfik cidalü barizen  
Zümrei vi salihani bi hesabu bemehan Rumyan şev kap hejandin bi gurur  
Hulleyi cennet di hatin bi selatu bin kefen

#### Qeside (Bî şîklê rastkiri)

Ev cihada di cihan da te kiri  
Bûye şan di nav alemê da te ziya sed müsteri Hazreti Sani mukemmel vehûbê ebû (babî) Şêx Eli  
Bû fedai qewlê Ahmed sed weli bûn müsteri Wexti idam û ifadan şeng û şox  
Di hitama mehkemê da ehli cennet mubşeri Quweta wi ci dizanibû sed mela û meşayıq  
Ji alimên wexta bî zulmen şehid e  
Ew merakibi hesaban lev (tev) bî Ahmed ra man

Bî wi ra terfiq cidal û barizen  
Zumreyi vi salıxdanî bê hesab û bî mehan Romiyan şev kap hejandin bî xurûr  
Hulleyi cennet dihatin bî selat û bûn kefen

Ji ber ku zimanê vê kasidê giran e, gelek gotinê Erebi tevlê ne, bî alikariya tercuma wê ya Tırki, gor Kurmanciya iro li jêr şerh dikim:

Ev cihada ku te kir di cihanê da  
Wek ronahiya sed müsteri (1) deng da  
Bavê Şêx Eli cardin giha kemalê  
Ji bo qewlê Pêxember sed weli (2) canê xe fida kîrin  
Dema pîrs û dardakîrinê şeng û şox bû

Dî dawiya mehkemê da jê ra mizginiya cenevê hat

Jî fêmkirina batinê (3) gelek hunermend bû  
Dî vi ali da sed zana û şair (4) berê wi ne  
digirt

Ew kesên zana ku bî destê zaliman şehid bin  
Ew li wê dinê bî Pêxember ra ne û li gune û  
sewaban dinêrin

Ewênu ku hevalên wi bûn li şer û pevçûn  
Hemû bê gune ne û tiştek ji wan nayê pîrsin  
Romîyan şev bendê sêpiyan hejandin, bî  
pozbîlindi  
Cilêni cînetê dihatin bî selat û dibûn kefen.

### Têbini:

(\*) Dî vir da behsa "4" kîlaman dibe û xuya  
ye ku tenê "beşa yekem" hatîye nişandan. Jî vê  
ji tê fêmkirin ku hin çend kîlam hene ku di ra -  
porê da ci ne girtine, yê ku girtine ji kêm in.

(1) Muşteri : Jî bo jupiter tê gotin.

(2) Weli : Bi maneya merivê zana û bumbarek  
e.

(3) Batin : Veşarti, tiştê ku xuya nake.

(4) Di şiklê esli da ev gotin "mîlai meşarı"  
ye, ku xelet hatîye nivisandin; min gor tercuma  
Turki "zana û şair" nivisand.

## Hêvi û derman

Rojek ji rojan  
Derdek h min peyda bû pîr bi kovan.  
Min pîrs kîr ji hekim,  
Pîrs kîr ji loqman,  
Sareza û rezan.  
Gohî: "derde te derdeki bederman  
Becare û per giran"  
Ketim xem û xeyalan.  
Ketim bin bareki giran.  
Li nûr wînda nekir tu cat.  
Hevi û gunan.  
Her weha derbas bû çend zeman  
Disa rojekti ji rojan  
Ketim xewneke gunan  
Hat pes cavén min  
Penc kaleci bî hebel  
Yek rûsipi û bi saşik  
Yek bejindirêj û çiyayı  
Yek bi şal û şapik  
Yek bi cilêni eskeri  
Ye mayî bi cilêni sivil  
Û gelek medeni.  
Li navsera ciya, li şer zinareki  
Li hev rûmstibun.  
Kale rûsipi deng h min kîr  
Goc: "Kurî min!"  
Ew derde te yê bi kovan  
Li sere me ji gerand xaxê giran  
Jî bo çare  
Jî bo derman  
Bezand h desî û çryan.  
Jî vi derdi ra em bi xwe  
Bun hekim, bun loqman,  
Bun rezan, bun carezan.

Me dit derman.  
Derman? ?  
Ne melhema destê hekimani,  
Ne ji pecektâ birman bû!  
Ew baweri bû.  
Hevi bû.  
Zanîn bû.  
Sethildan bû.  
Jî bo gele me yê tibûyl.  
Burçibûyl.  
Dilbûyl.  
Peskek av bû.  
Keriki nam bû.  
Jîyan bû.  
Azadi bû.  
Here kure min, here!  
Derman di destê te da ye.  
Çare di destê te da ye.  
Ger tu hibi azad.  
Li dora te namine tu nexwesi.  
Here kure min, here!  
Ü jî bir neki!  
Eger tu di re da binim  
Ü ji nive re vegeri.  
Wê xezeba me li te bibari.  
Eger tu qelsi misan bîdi.  
Wê misren me li te bibiri ari.  
Here kure min, here!  
Eger tu şireten me ji bir neki  
Riya te vekiri ye."

A. GERNAS

# Kara dizika qatix

ESER DÜZÜNTÜYER

Sente IRO

## 1

Panzdeh-bist sal ji wê roja nav û nişan derbaz bûbûn, wexta dî Ermenistanê da qeydê sovêtîyê hatibûne testiqkîrin. Gundê me da idî kolxoz hatibûne sazkîrin. Koçeran terka emrê (jiyan) xwe yê perişan dabûn, ketübûne kolxozê, edilibûn, bêminet dixebeitin. Ewana roj bî roj, sal bî sal halê xwe xwaş dikirin, dibûne xwey mal, xweyê rîsq û xweyê keda helal. Lê gun-diyê me hineka mina pêşiyên xwe yên ji ela ortila pêşekê xwe ji bir nedikîrin. Ewana car-na qatix difrotin. Wexta bahar dîhat, leyланê dîlist, lî denge dibû borina hoza rengin, keva-niya beroşê xwe hildîdan, hîlkutk lî hiyar dixistin, şir dîdotin, qatix dîmeyandin, şûnda vedigeriyane malêd xwe, mîra ji rojtîra dinê ew qatix dibîrin şeher, difrotin, şûnda vedigeriyane malêd xwe, weki sîbetûra dinê disa qatix bibîne şeher. Bîrêd mîne mezîn-Üsiv, Esed û E'mo ji wi ali da ji cinara paşda nediman. Wana ji qatix dibîrin dikirine pere û dianin, dîdane diya min.

Ez wan çaxa idî êpêceyi mezîn bûm, dîçûme ber berxê me. Min zehf ji xwendinê hız dikir. Herroj, wexta royê nedir dîda, min berx berdîdan, dî hevana nanê min da xênci şelikê qatix, toraqa sırimkîri û çend nanê sêlê, ese kitêbek, gazet, qelem ji hebûn.

Ewê salê bahar zû hat, şili ji bî gotina we dîbari, heywanê doşani têr dixar, gîrêş diji şir dikir, berbi mal dilezand, ku şir bîde sexelêd xwe. Diya min ji mina kevaniyê dinê, berxa ra şir helal parevedikir, ewê pez serdoş dikir, hinek şir ji berxa ra dîhişt.

Rojekê, wexta min berx biribûne çêre, diya

mîn û birê min va şêwra xwe kîribûn, weki min ji hini qatix firotanê bikin. Min êvarê berx anîne dena, êdi hîvîya kîskîrinê ne-sekinim, çûme mal û min şîva xwe xwar. Ta-riyê idî erd hîldîçinî, kuçîkeki terki, lî bin hê-siya konê me da dadan, kulav ji koşê sitêr anîn, danîn em ser rûniştin, disa xeberdana me dest pê bû. Lê ewê êvarê diya mina mina xwe hercar derheqa sala revê û ser da gur Heso da gîli nekir. Ew vege riya ser min, xeberdana xwe bî vi teheri dest pê kir,

- Sîvik, lao, sîvî tu goti qatixê me bîbi bîfroşî.

- Qatixê çî? Lê çîma lawîke çî pêşê ne? - Min pîrs kir û navê birêd xwe yeko-yeko hilda.

Lawîk idî, şikir ji erdê heta ezmin, hini qatixfirotanê bûne, pak yanê xîrab, heyweleh, hinbûne. Ewan idî xwe ra pêşek destanine. Nîha ji dor dora te ye, lao axîr ne tu ji wê zûtîrê bîbi xwey mal, xwey hal, lê kî hasîlkinga te hilde, dayne. Silameti dû te ra ji eszê Hemo û Celal hinbikim, gune ne, bîra ji hevalê xwe neminin.

Ez tûrsana bûme qurom, ricifim.

- Canım, -min got- lê kî here ber berxa. Paşê ji ez ku, qatix ku?

- Tu seva berxa telaşê mekşîne, şikir lawîk bol in, qet guhê tu berxekê ji xûn nabe. Sîbê teng û berê xwe bîşidîne, te û qatix va malex-weş; qatix bîfroşî, mera hîne sabûn, spiçke (Kîbrît. N.RN) n bîstîne, perê din ji têke berriya xwe ya bîni, bîne mal, ezê bavêjîme bînê kîskê xwe, weki silameti payizê we ra kînca bîstînim. Lê çawa, lao here şeher, dinê bîbîne

xwe ra hinbe, evan berxa idi tu sews kuri, here bira gunê te stûyê min da nemine. Mêra jê-hatin, lao kar-qar?

Mefera min hate birin. Min idi nizanbû çi bikira. Ez hê usa duşurmiş dibûm (Difikirim), wexta diya min gazi mecitê kurapê min kîr û gotêda:

Mecit, qurbana te me, wexta şev radibi qatix dibi, me ji hisiyarke, heve qatixingê me ji heye. Sivikê bine bifroşe.

- Kê bine?

- Sivik.

- Canim, Sivik ku, qatixfirotan ku. Qet aqilê min ji wi nabire, tu were tişte jê dernekeve.

Dû van giliya ra hineki qudûm ber çokê min da hat, min lavayi diya xwe kîr, weki min neşine, lê çare lî wê nebû.

## 2

İdi şev ziz bû, kuçkê me hêdi hêdi temiri, hemû tiş seqiri, em rabûn- ketne nava ciyê xwe.

Ewê şevê kervana xewa min nehat, te digot ciyê min hêlinâ mûr-mûrka bû. Sawa qatix dil û hinavê min da feraş dabû. Bextê min ra bû ewravi baran bari. Qırçe-qırça baranê bû usa hêşiyê kon dikutan, ku meriv hewaz-hizmekar bû şirin şirin raza. Xewa min nedihat, min carana serê xwe ji bin lihêfê derdixist dînhêri, çika hela sibe ron nabe, lê xênci tiremarê zêrin, ku ku ji hingavtinê pêşda nedihatın, tişteki din tunebû.

Ezi hê usa nava sewtê da bûm, idi nizanım bi çi teheri, hineki xırmaş bûbûm, wexta nişkêva bû qirina lawkê oba me yê qatixfiros.

- Oro mala we xirav neve, ro hatiye nîvro, emê hê razayı ne.

- Na, na lawko metîrsin, hê zû ye, dikê mala pir Dûko hema hêja bangda.- yeki dinê digot.

- Mala bais xirav be, par na pêrar siheta minê bi kureki şkêñandin, niha emê çîma destbiri bibûna,- ê sisiya bi vi teheri şikiyat dikir.

Bû qalme-qalm, hewirzeke neditiye usa, ku kelb xweyê xwe nas nedikir. Lî kîrin ji kevir dihat, deng ji min nedihat.

Kutasi qatixfirosa ya xwe kîrine yek, weki rabîn rêkevin. Şili ji hela hala ra dibari.

- Sivik! - Diya min nişkêva kire gazi.

- Ha, - bû nelina min.

- Qurbana te me rabe tu ji hevala mayi, xireta te çawa tamul dike?

- Ki ku di emrê xwe da her carekê wextê şiliya, bin kon da razave, wê pêra-pêra fem bike, çika ez ketibûme çi hali. Min xwezla xwe herdu birêd xweye biçük dani, êd ku serfinyaz ketibûne xewa hingorê, şirin şirin fişe-fişa wan bû.

- Sivik! De rabe lao, - diya min disa got.

Min idi xwe zevt nekir, giryam, hêşir ji çavê min barin. Diya min ber min digeriya, ku ez rabim.

- Daê, - min got - lê qet xudê we heye, vê şili-şilopê van ewr-ezmana hûn min ji mal derdixin.

Bû tiqe-tiqa hersê birê mine mezin, kenyan.

- Kuro, hevalê te wê diciñe aş û arvana, şevê bereder diminin, kîrin-firotanê dikin, te tirê ti çuki, çawan e? Birê mini mezin got.

İdi çara min hate birinê. Ez rabûm û lawika ra rêketim. De xêr û xwaşı ser we da bê, kevir kuçik ser min da, kevireki qirê derê nema wê şevê lingê min lê neket...

Hê qereberbang bû em gihiştne şerh. Şeherlû temame hê razayı bûn. Lawkêd me leze-lez dizkêd xwe hildidan, çûne kûça û mina dikê berbangê deng lî hevra birin "Lav mazûn!"... "Oçxari mazûn!" .. Min ji diza xwe hilda, hineki pêşda çûm, min ji dixwest mina lawka bigota "Lav mazûn", lê şermana deng ji min dînerdiket, te digot ritile qırquşûn zimanê min va girêdabûn.

Min xwexwe qerf xwe dikirin, weki mina lawika nîkarim bikme gazi. Min qîrar dikir bîqirim, ez cida dîsekînim, min dor û berê xwe dînhêri, lê disa şermê zimanê min qepeşe dikir. Min dil dîda xwe: "Canim şems (Ro,tav) hê teze nedir daye, ez çîma lez dikevîm, hema goti bikme qirin, çîma şeherlû dîza destê min da nabinin. Qatix kî lazimbe, wê bi xwe ji min bipirse, çika ez çi difroşim..."

Bextê min ra keseki ji ji min nedipirsi. Wehdeji dibuhuri. Çara min hate birinê, ez vege riyaname ciyê hêwra me, lawîk temam berev bûbûn, av lî binê dîza werdabûn, nan hûrkîribûnêda, dîdane ber kevçiya.

- Kuro Sivik, tu çîma awqasi dereng hati, ne



emê hiviya tene - Mecitê kurapê mîn pîrsi.

- Çawa bikum, Meco, qatîx nayê firotanê.

- Çawa? Te hê nefrotiye?

- Na.

Bû pirqe-pirqa temama, kenyan.

İdi dereng bû. Mîn ji qatîx awqasi gerandibû, ku bûbû dew, nedîhate firotan ji. Lema ji lawka qîrar kîr, qatîxê mîn têkne barê merkebê, ku em paşda bibin. Wana usa ji kîr.

Ro devdevi ava bû. Em gîhiştne obê. Mîn diya xwe ra gili kîr, weki hal û hevalê mîn û qatîx ev e. Ew berê hîneki hêrs bû, paşê ber dîlê mîn da hat:

- Tişte nake, lao, tu hê pari zar i, hevalê te hê ji ber tendûrê dûr nakevin, silameti ku tu mezin bûyi, tê xwe ra hinbi. Beşera mîn heveki xweş bû.

Nışkêva xalê mîn Siyabend hate mala me, ewi usa pîrçûyê xwe kîribû mina rojekê payizê.

- Sîvîk kanê? - Ewi pîrsi- Ca mîn ra binin ez tûyi rûya bikim. Lê mîn... lê mîn... - Ewi vira çêri mîn kîr, xeberdana xwe dirêj kîr. -Lawo,

lê axiriya te wê çawabe? Tu ne dikari ber dirûnga kavira bisekini, ne ruhmal i, ne qatîx dikari bifroşî, ne ji kulekekê dikari qazinc biki, lê axiriya te wê çawa be?

Hucê, - Ewi nışkêva ji diya mîn ra got, - Xênci xwendinê tiştek ji vi nayê, evi ese bisine bîra here xwera hinbe, bîra zanibe dew birê mast e, yanêna evê bîrçiya bimre, gunê wi tîkeve stûyê me, xelq ji wê heta-hetaê tûyi cînyazê me û hevt bavê me bike.

Diya mîn lehzekê kerr bû, paşê got:

- Bîrabe, Siabend, payiz xêr, silameti ser heftê û du milleti dahat, ser me da ji tevayı, eze Sîvîk bisinime xwendinê.

Gele wehde ji wê rojê derbaz bûye. Xalê mîn Siabend diha rînd dizane weki xwendin cûreki cezaê nine.

Nîha carana beserek ser dêmê mîn tê xanê, ew roja bihuri tê bîra mîn, ez hezar cari xwezla xwe tinim, weki ew qatîxê mîn bir nehate firotanê.

(Ji pîrtûka "Zmanê Kurdi-" O. Celil)

## Şiéra Kurdi ya klasik, sofiti û

# MEWLEWI

A. Gernas

### ŞIERA KURDİ YA KLASİK Û SOFITİ

Dî literatura Rojhilatê ya oriyentalî da, literatura Kurdi ya klasik ciheki gîring dîgre. Zanya-rêv vê hêlê dewlemendiya literatura Kurdi gelek caran kîfş kîrîne û pesnê wê dane. Eger meriv lêkolinêni li ser literatura gelên navçê raçav bike, gelek aşkera dibine ku li ser literatura Kurdi lêkolinêni têr û tije nehatîne kîrin û bi kûrahi ser çavkaniyan nehatîne vekîrin. Sedemê vê yekê girêdayî tarixa siyasi ya Kurdistanê ye. Dewletêna dabeşkar, ên ku Kurdistanê di nav xwe da parvekîrine, li pêsiya lêkolina çand, edebiyat, folklor, tarix, sinet û gelek bermahiyêni din bordan lêkîrine, bi zordari, bi qedexe û asimilasyonê li windakîrina wan bermahiyêni nete-veyi geriyane.

Bî xebata edebiyatnasê mezin Eladdin Seccadi, Qanatê Kurdo û gelekêni din astengi û bendêngî dagîrkeran ne bi tevayı be ji hatîne helîşandin, mezinahi û hostatiya şair û nîvîskarîn me yên klasik hatîne kîfş kîrin. Mezinahiya van şairêni me ne tenê ji ali Kurdan, her wîsa ji ali gelek nîvîskar, edebiyatzan û tarixzanêni Ewrûpi, Rojhiliyi ji hatîne kîfşkîrin û navê wan di nav şairêni dînyayê yên heri bijare da hatîne bi cih kîrin.

Dî navâ şairêni me yên klasik da sê şairêni tesewifê yên navdar hene. Baba Tahir Uryani, Melayê Cîziri (1570-1640) û Mewlewi (1806-1882). Berê di nav rûpelêni Roja Nû da li ser Baba Tahir Uryani û Melayê Cîziri hatîbû nîvisandin. Her weha em ê di vê nîvisê da li

ser babeta tesewif an ji sofiti, jiyan û xebatêni Mewlewi bisekînin.

### TESEWIF (SOFITI) Û EDEBIYAT

Sofiti reh û riçalêni xwe yên jiyanê ji ol distîne. Ew fîkir û ramanekî oli û sîri ye. Rastiya raman û armancêni sofitiyê tucar bi awayeki aşkera nayê kîfş kîrin. Xusûsiyeta wi yên heri mezin, felsefa wi yên sîri ye.

Dî felsefa sofitiyê da bi riya aqîl û hestan bi Xwedê ra pêwendî danin heye, pê ra jiyan heye. Ev baweriya sîri pîri caran bi rengê evina Xwedê xwe dîde nişandan. Lî ev bengini dî edebiyata tesewifi da, xwe wek evina Xwedê aşkera bi nav nake. Ev evin pîri caran wek evina navbera sofi û keçekê, wek têkiliya navbera mey û meyxur an ji tişteki abstrak dikare bête xuyan. Her wîsa di edebiyatê da tesewif, pîri caran bi him sembolan têni rawekîrin û xuyan. Wek minak, van peyvîn sembolik di van maneyan da hatîne bi kar anin: "Bengin", kesê ku bi evina Xwedê dişewîte; "maşûq", Xwedê; "mey", evina Xwedê; "saki", rîber; "meyxane", dergeh.

Dî sofitiyê da armancê hedefenî oli, bi metod û rîyêni aşkera yên gelêri nayêni bi kar anin. Gihiştina armancê bi metodek sîri, bi riya aqîl û hestan tê meşandin. Anglo bi riya aqîl û hestan sofi dişihîje Xwedê, xwe di raman û hesten xwe da dikuje, dîbe şirikê jiyana Xwedê û bi vi awayi dişihîje nemiriyê.

Gava meriv li diroka sofityê hûr dibe, dibine ku di sofitya pêşin da felsefeki weha tune. Sofiyê ewil diketin silûkê û destê xwe ji kar û barêñ dînyayı dîkişandin. Jiyanake ferdi û oli hîldibjartın. Xwe tenê dîdan perestin û erkên oli. Haya wan ji ilm tune bû û li ser mane û şirovekirina pirtükên oli yên piroz nedisekinin. Anglo bi nezani û xemkêsi, olperestiyeki bêhed dîdomandın. Bêguman sofityeki weha digihije fanatikiya koriti. Baweri ew e ku, sofiyê weha jiyana Hz. Muhammed wek nimûne dîgrin û dixwazin dirûvê jiyana xwe bi ya Hz. Muhammed xin. Lewra gava Hz. Muhammed ji, ji bo pêxemberiya islamê xwe amade kîribû jiyaneke weha hilbijartibû.

Sofitya ku xwe dîpart olperestiyeki saf û tenê erkên oli, di nava zeman da guhuri û bi felsefeyeke mistik rengeki din stend. Bi felsefa panteisti û batînîti, sofity du fam û firaseten bingehin wergirt. Ew ji felsefa wahdet-i wucûd û şirovekirina wi yê siri ye. Li gor felsefa wahdet-i wucût afirandêr (Xwedê) û afirandi (insan-sofi) eyni tişt e, ji eyni çavkaniyê têñ.

Bi felsefa panteist û batînîti, tesewif digihije van qonaxan:

**Qonaxa İlmelyeqin :** Dî vê qonaxê da sofi wek her insanê normal li ol dînihêre û erkên wi ji wek insanê din bi cih tine.

**Qonaxa Aynelyeqin :** Dî vê qonaxê da sofi, ji tiştên diti derbasi tiştên nediti dibe, dîkeve kûrahiya ol.

**Qonaxa Heqelyeqin :** Dî vê qonaxê da sofi, digihije armancê rasti yên oli û di baweriyeke tam û qewi da dîmre û di Xwedê da digihije nemîriyê.

Li ser vê qonaxa dawi Cuneyd-i Baxdadi weha dibêje: "Tesevíf, tê wê maneyê ku Xwedê te di te bi xwe da dikuje û bi xwe ra dide jiyandin." Zanyarê sofityê yê navdar İman Gazali (1055-1111) ji weha dibêje: "Sofiti, nêzikbûna Xwedê ye" û weha berdewam dike, "eger meriv xwediyê van cewheran be dikare bibe sofi: 1- Xwe bi Xwedê va girêdan û xemkîşandin (el-muraqabe). 2- Li fikir û ramanêñ kûr xerikbûn (el-tefekkûr). 3- Dayina bê bersiv an ji bê daxwazi (el-mewaqib). 4- Ji xwe va çûn (el-wecd)" Herweha li gor Gazali, eger meriv dev ji hemû daxwaziyêñ xwe berde dikare bigihije Xwedê û wd. Disa li gor Muhyeddin Erebi (1162-1240), ku wek zanyarê sofityê yê duyemin tê naskîrin, felsefa sofityê weha tê şirovekirin: "Hemû pirs, di pîrsa Xwedê da dicivin û bi wi têñ rawekirin. Di hemû tiştên cihani da Xwedê tê xuyan, kesê ku

evindarê tişteki bûbe di rastiyê da ew evindarê Xwedê dibe".

Gîhiştina qata Xwedê û pêra jiyan, felsefe û armanca bingehin a sofityê ye. Ev ditin ji ali gelek zanyarên tesewifê va hatiye ziman. Wek İman Gazali, Muhyeddin Erebi, Sadredin Konevi, Nasır Tûsi, Mela Cami, İman Rabbani, Sadreddin Şirazi û gelekên din.

Em ê rawekirina sofityê bi jêderkeke pirtûka Prof. Annemarie Schimmel kuta bikin : "Li ser Sofiti yan ji Tesewifê nîvisandin gelek zehmet e. Bi gavê pêşin ra, zincira çiyayan dertê pêşıya meriv, eger meriv bixwaze meşa xwe bîdomine, di her gavi da gîhiştina hedefê dijwartır dibe. Herweha meriv careki bigihije wê derê, dibine ku, ew cihê ku meriv gîhiştiyê di nava meriv bi xwe da ye."

Piştî vê kurtenasiya sofityê, em dikarin ve gerin ser şairê mezîn ê Kurd ê tesewifê, Mewlewi.

## MEWLEWI (1806 - 1882)

Navê Mewlewi yê rasti Seyid Abdulrehim e û kurê mela Seid Tawegozi ye. Dî sala 1806'an da li gundê Serşatê, li navça Tawegozê hatiye dînê.

Mewlewi, li gor urf û adetên Kurdi yên wê demê perwerde bûye û perwerdeyiya mezintirin ji bavê xwe wergirtiye. Paşê li ber destê gelek mela û mamosteyen cihê yên Kurdistanê xwendîna xwe domandiye. Ji bo xwendinê li gelek bajar û gundên Kurdistanê geriyaye, wek Helepçe, Xerpani, Xurmal, Biyare, Tewêle, Pawe, Cor, Sîne (li Medresa Wezir), Bane û Silêmani (li Medresa Mezin). Piştî perwerdeyiyeke dûr û direj vedigere bajarê Helepçe û li Medresa Camia da xwendinê dîdomine. Dî vê demê da bavê Mewlewi diçê ser heqiya xwe û her weha Mewlewi ji bo aborandina malbata xwe navbir dide xwendin û lêkolinê xwe. Demek şunda cardin vedigere ser xebata xwe. Pêşî li Kela Ciwanro, paşê ji li Sîne, li Mizgefta Dar-ul-isan û li cih û warê xwe xwendîna xwe dîdomine.

Mewlewi, xwendîna xwe li ba Abdulrehman Nodşeyi kuta dike. Mela Abdulrehman Nodşeyi li bajarê Silêmaniye, ku wê demê serbajarê Mîritiya Baban bû, li xwendegeha Melkendi mamosteyi dikir. Ahmed Paşayê mirê Baban bi xwe di kutakirina xwendîna Mewlewi da merasi-

meke kevneşopi çedike. Piştî kutakırına xwendinê Mewlewi, wek mela dice Çirustanê (nêzi Helepçe ye) û lî wê derê mizgeftek lêdike û tê da mamosteyi dike.

Dî çündin û hatinê xwe da, Mewlewi, çend malbatê Afgani nas dike. Pêwendiyên navbera wi û malbatê Afgani xurt dibe û navê Mewlewi ji, ji ali Afganiyan lê tê danin. Navê Mewlewi li ba Afganiyan tê mana "insanê zana" yan ji "zanyar". Her weha têkiliyên navbera wi û Afganiyan dibe sedem, ku ew ji keçekte Afgani hez bike û dî dawiyê da ji pê ra bîzewice. Navê keçika ku Mewlewi pê ra dizewice, Enber e.

Dî navbera Miritiya Baban, Ardelan, şêxên mezin ên teriqeta Nexşibendi û Mewlewi da pêwendiyên xurt hebûye. Ev pêwendiyên han, gelek imkan danine pêşîya Mewlewi. Lê ew ji van imkanan kelk negirtiye û jiyaneke sade û feqiri hilbijartîye. Piraniya jiyana xwe daye xwendin, lêkolin û niviskariyê.

Dî çend salêن dawi yên jiyana wi da, çend bûyerên trajedik dîqewimin, ku qismek ji şîrên wi li ser van bûyeran in. Enbera jina wi dîmre. Ew ji heft sal piştî mirîna jina xwe kor dibe. Agir bi pirtûkxana wi û destnivisê wi dikeve û gelek bûyerên din. Lê afîrandêriya Mewlewi bênavbir dom dike.

Korbûna Mewlewi dibe sedemê mirînek zûtûr. Rojeki li ser riya malê ji ber şaşıya destkêşê hespê wi, ew li şaxê dareki diqelîbe û ji ser hespê dikeve xwarê. Bi ketinê ra piştî wi dîşkê û çend roj şunda, dî sala 1882'an da dice ser heqîya xwe.

### Berhemêن Mewlewi

Berhemâ wi ya heri mezin Diwan e. Diwana Mewlewi, ji berhevokên şîrên wi pêk hatiye û cara yekem dî sala 1935'an da, dî bin redaktoriya şairê mezin Piremêrd da hatiye weşandin. Berya ku Diwana wi bête çapkîrin, nusxeyên destnivis ên şîrên wi dî nava gel da belav bûbûn û hatûbûn naskîrin. Diwan bi pêşgotin û raweyên Mela Abdulkérîm Muderris der çûye. Ji bili Diwanê, Mewlewi, ev berhemên jêr ji nivisiye:

1- Diwaneki çarinan dî derheqa pirsên oli da. Pirtûk bi Kurdi hatiye nivisin û hêj nehatiye çapkîrin. Destnivisê vê pirtûkê dî nav xelkê da, li mizgeftan û li ba melayan hene. Hemû şîrên vê pirtûkê dî sala 1940 da li mizgeftên Kurdistanê hatîne xwendin.

2- "Al-Aqida Al-Marziya". Ev berhem bi Kurdi

hatiye nivisin û lî ser jiyana meseba Aşari ya oli ye. Pirtûk ji 2452 beytan pêk hatiye.

3- "Al-Fawâih" (Bêhnêن Xwes). Nîvis bî zîmanê Farîsi ye, ji 527 beytan pêk hatiye û dî derheqa ol da ye. Ev nîvis tevi "Al-Aqida Al-Marziya" ji ali çapxaneki Mîsîri va, dî sala 1933'an da hatiye weşandin. Çapeke vê berhemê ji, bi wêne û têkûzkiri di van salêن dawi da cardin hatiye çapkîrin.

4- Kurteniviseki derheqa rê û prensibên teriqeta Nexşibendi da. Ev kurtenivis bî zîmanê Farîsi ye û wek destnivis heye, ango nehatiye çapkîrin.

5- "Al-Fadila". Ev berhem dî 1868'an da bî Erebi hatiye nivisin û ji 2031 beytan pêk hatiye. Pirtûk pîrsen oli munâqeşe dike. Dî sala 1972'an da ji ali Mela Abdulkérîm Muderris va bî rawe û analizan, di bin navê "Al-Wasile Fi şerh Al-Fadila" da hatiye çapkîrin.

6- Tê gotin ku wi dî bin navê "Xaturat-i Mewlewi" (Biraninê Mewlewi) da pirtûkek nivisiye, lê heta iro rastiya vê gotinê dernekeciye holê.

Wek şaireki navdar û alîmeki mezin Mewlewi, bi gelek alîm, mir û hunermendêñ dewra xwe ra him wek şexs him ji bi nameyan têkili daniye. Dî 1983'an da 38 nameyên wi ji ali Mela Abdulkérîm Muderris va hatîne weşandin. Ev nameyên han, jiyan û şexsiyeta Mewlewi pirali dderdixin ronahiyê.

### Form û naveroka şîrên Mewlewi

Piraniya şîrên Mewlewi, derheqa têkiliyên dini yên navbera sofi û şêxê wi da ye. Wek hemû şairê tesewifê, Mewlewi ji, dî şîrên xwe da êşa sofi tine ziman. Ji bo ku sofi bikaribe bigihije qata Xwedê û cihê evina xwedayı, dîvê hînek astengiyan ji pêşîya xwe hilde û ji hînek qonaxan derbas bîbe. Ji bo ku bigihije vê armancê, dîvê rîhê xwe ji qîrêja dînyaya maddi paqîj bîke û bî alikariya şêxê xwe yê ruhani bigihije mebestê. Pêwendiyâ navbera sofi û şêxê wi, pêwendiyekî ruhi ye, evineke xwedayı ye. Bi kurti prosesa evina xwedayı, dî şîrên Mewlewi da babeta sereke ye. Mewlewi bi şîrên xwe yên tesewifê bî şîrên Melayê Cîzîri û Mehwîs ra ketiye têkiliyê.

Ji bili şîrên sofityê, Mewlewi, derheqa gelek bûyerên jiyana xwe da ji şîr nivisiye. Li ser mirîna Enber Xatûna jina xwe, gelek gazin û lîrikên evini yên giranbiha; li ser koritiya xwe, li ser hezkirina pirtûkan û pirtûkxana xwe ya

agîrpêketi nîvisiye. Çend şîer ji lî ser hevalên xwe nîvisiye.

Wi şîrên xwe bî zaravê Hewrami yê Kurdi nîvisiye. Forma ku dî diwana xwe da bî kar aniye Mesnewi\* ye. Ritim, ritma kevneşopi ya Kurdi ye. Lê ji ali wezin va, ji şairên klasik ên oriyental cudatîr wezneki, wezna Yarsan (wezna stranê dîni yên Kurdi) bî kar aniye. Anglo wi, wek şairên Kurd ên klasik wezna "arûz" bî kar neaniye.

Wek tê zanin sofitiya islami ji ali ideoloji û filozofi da bandoreke gîran daniye. Ev bandor

lî welatêن Rojhîlati jiyanekê nû daye şîer û ramanê sofitiyê. Gelek nîviskar û şairên sofitiyê, ji vê ramanê ilham stendin û gelek berhemêن hêje afîrandin.

Xusûsiyeta Mewlewi ew e ku, wi xwe bî rê û prensibên sofitiyê yên kevneşopi va girê nedaye. Bî tecrubeyên jiyana xwe dî navbera ramanê nû da kombinezoneki datine û dî literatura Kurdi da rîyekî nû peyda dîke. Ev rîçika nûjen him di forma şîer da him ji dî naverokê da xwe nişan dîde. Lî jîrê ji şîrên wi, çend nûmûne hatine pêşkêşkirin.

## Çend helbestêن Mewlewi

Dest ew destnîgin ta xanem awîrd	Medû nedemax asbay çepgerd
Da bezim şirin xusrew we hemda	Asiyaw xaliyen nûbetensa, dey!
Camda we sercem, cem we sercemda	Cûn yaran daney mîniç hardewa
Şûret namey nam hatemeş kîrd tey	Wecoy çemey mey aw nediryabû
Kîrd wekasekel, kasey keley key	Layiq nin berûş bew asiyawa
Saqi gerd ardiyaran ham ferd	Weser kîştîda pey peyco, coy, mey
Seday asiyawçı meyû peyabey	Heftey axiri newbihar şen
Her katî zanay çerxi werdewa	Cey axreda daney werû
Be her ser deşti kîşti kiriyabû	We herkes weqet kefaf dad bi
Niyawabû xas danış bew awa	Danem rûsyay ham derdanîş bû!

Zû sanen wey reng we gerduñ yawan
Gicyan lûl gic kîriley kawan
Çe şirin zer ger, heway tofi serd
Goşware negoş newnemaman kerd
Pey nigay balay nemami bêgerd
Yex ayine girt, tem çarşiw awîrd!
Ey mehbûb xas wey benay temam
Menalû pey bezim saqi û şîse û cam
Axır sermeşqen peri meyxwaran
Wardey û yerdey û yardey yaran!
Zîwanekey sûzû, destekî piyale
Bîkyanû riz û rehmet piyale
Rehmet wecoy xak ristgaranda
Piyale da we dem intizaranda
Dêren ba êmeyç ney gozerewa
Cami weser nin des weserewa!

Çavkaniya jiyan û helbestêن Mewlewi:

"Svensk Kurdisk Journal", Mêjûy Edebi Kurdi-Eladdin Secadi

# Meqamê Dawetê

## SELMA LAGERLÖF

(1858-1940) Yek ji niviskarên swêdi yên heri bî nav û deng e. Berhemên wê bî gelek zimanê dînyayê ji hatine weşandin.

Lî jêrê, em cih didin serpîhatiyeke wê ya kurt.

Niha ez ê behsa serpîhatiyeke xweş bikim.

Gelek salan beri niha, lî nehiya Svartsjön, lî Varmlandê daweteke mezin wê çêbûya. Pişti merasima lî dêrê, wê sê rojan lî ser hev kêt u şahi bûya. Û herroj ji danê êvarê heta derengê şevê wê dans bikirana.

Jî ber ku wê ewqas pîr dans bikirana, gîring bû ku sazbendeki baş bîhata peydakîrin. Lê encumanê nehiyê Nils Elofsson yê ku serdaweti bû, nedixwast bangi wi sazbendê ku lî Svartsjö hebû bike. Navê wi Jan Öster bû, û encuman baş pê dizanibû ku ew sazbendeki geleki bî nav û deng bû, lê meriveki wîsa hejar û feqîr bû, ku gelek caran bî faykê (qazax) diriyayı û pêxas dihate dawetan. Û belengazeki mina wi, encuman nedixwast lî pêşîya merasimê bibine.

Di dawiyê da bîryar da ku xulameki bîşine pey meriveki bî navê Lêdixe-Morten ji Jösseharad, û jê pîrs bikin ka dîxwaze were û dî daweta wan da sazbendiyê bike.

Lêdixe-Morten, qet saniyekî ji dudli nekir û pêra bersîva xwe da û got ku ew naxwaze here dawetên Svartsjö, çimki lî wir sazbendeki bêqisûr heye û ji hemû sazbendên navça Varmlandê jêhatitir e.

Gava Nils Elofsson ev bersîv wergirt, qasidek şande pey sazbendeki nehiya Stora Kils, navê wi Olle'yê Saby bû.

Lê Olle'yê Saby ji wek Lêdixe Morten bersîv da. Wi ji nedixwast here nehiyekî dîn ku lî wêderê sazbendeki ewqas navdar wek Jan Öster hebû.

Dema Nils Elofsson, ji Olle'yê Saby ev bersîv wergirt, rabû xulamek ji sazbend Lars Larsson ra şand, ku ew ji lî Ansgardetê lî Ulle-

ruds dijiya.

Lî gor encuman, Lars Larsson meriveki hal wextê wi xweş bû, xwediyê mîrg û zeviyên baş bû. Meriveki bî aqil û bî firaset bû, ne wek sazbendê din berdûş bû.

Wexta Lars Larsson gudariya qasid kîr, pêra Jan Öster ani bira xwe, gelo çi qewimibû, ku wan bangi Jan Öster nekîribûn?..

Xulam dit ku ya heri baş ew e ku, jêra rastiyê salîx bîde. Lars Larsson baş guhdariya xulam kîr. Paşê lehzeki bêdeng ma û hineki fikiri. Lê dî dawiyê da disa ji bersîva erêni da.


Yekşema dîn siwar bû çû dêra Svartsjö. Ajot çû hevrazê dêrê, ji wir ji wê berbi dêrê bîmeşiyana. Cîvata dawetê ji êdi xwe rînd amade kîribû ku bîmeşe.

Ew bî paytona xwe ya yekhespi hate nav cîvatê, desek kîncêñ reş lî xwe tîribû, û ji sandoqeko birîqi kemança xwe derxist. Nils Elofsson bî rûyekî xweş xêrhatina wi kîr. Ev sazbendê han bî dîlê wi bû, lî gor wi ev sazbendeki wîsa bû ku meriv dikaribû pê serbilind bûya.

Lehzeki pişti hatîna Lar Larsson, Jan Öster ji dî pilçenga wi da kemança wi, peyati hate wir. Raste-rast çû nava cîvata lî dor bûkê, eyni mina ku ew ji hatîye vexwendin bo ku sazbendiya dawetê bike.

Wexta çavê encuman bî Jan Öster ket, wi dî cih da fehm kîr ku qesmerekî lî ser navê wi çûye bangi wi kîriye. Lê ne zemanê wê yekê bû ku bela xwe pêda, yan ji ew ji wir biqewitanda. Merasima bûkê êdi amade bûbû û wê dest pê bikira. Loma pêşda çû û ji Jan Öster ra ji xêrhatin got.

Dûra herdu sazbendan, lî pêşîya rîzê cihê xwe



Jan Svartsson  
1978

girtin. Bük û zava ji ketin rêzê û sıwarên bükê cot bo cot rêzbûn û meşyan û li dû wan dê û bavên bük û zavê, û merivêن wan ên nêzik diçün û ji vexwendiyân rêzeke berbiçav pêk hatibû. Dema ku êdi hertiş wîsa bî rêk û pêk amade bûbû, sıwareki bükê çû pêşiyê û ji sazbenda ra got ku meqamê bükê lêxin.

Herdu sazbandan kemançen xwe rakırın, dan ber çena xwe. Lê hema wîsa dî şûna xwe da sekînîn û man. Bêî ku deng ji wan derkeve.

Çimki adeteki pir kevn bû lî Svartsjö, dî nav sazbandan da ki hostatîr bûya, pêwist bû wi serkêsi bikira, pêşiyê wi lêxista û yêñ din ji li dû wi biçûna.

Sıwarê bükê li çavê Lars Larsson dînihêri, mina ku bêje çîma lênaxi, lê Lars Larsson ji vege riya ser Jan Öster û got:

- Divê Jan Öster dest pê bike. Lê Jan Öster qe li xwe daneyni û bî tu awayeki neda xuyan ku yê din ji wi ne navdârtir e, û dî cih da got:

- Na, kerem bike! got. Na, kerem bike!

Lars Larsson ji cihê xwe neleqîya. Wîsa ji halê xwe razi û bî xwe bawer dî şûna xwe da sekînibû. Lê wi ji şîva kemançê ranekir.

- Divê Jan Öster dest pê bike, wi gotina xwe dubare kir. Wi peyvîn xwe wîsa hişk û bî bîryar digot, mina keseki ku bî rasti dixwast daxwaza xwe bine cih.

Lê Nils Elofsson pir bî hêrs bûbû çîma ku ewê din ewqas li ber Jan Öster digeriya. Çû nêziki Lars Larsson bû û dî guhê wi da got:

- Ez fehm dikim ku te gazi wi kiriye û anîye

dawetê, bona ku şerefê bîdi wi. Lê zû bike, dest pê bike! Eger tu dest pê neki ezê vi belengazi ji vir biqewtinim, bi koteke û rezaleti...!

- Belê heqê te heye, divê êdi em dawiya vi işi binin. Bî vê gotinê ra çend gavan pêşda çû û berê xwe zîvirande ser civatê, da ku herkes wi bibine. Şîva kemançê ji destê xwe dûr avêt, kêreke kevan derxist û pê herçar têlên kemançê birri ku dengê xîrpîn û çizineke bilind jê çû.

- Bîla kes li ser min xirab nebêje, ku ez xwe ji Jan Öster mezintir dibinim, wi got.

Lê herweha dîhat zanîn ku ew sê sal bû ku Jan Öster li ser meqameki dixebeitî, dikir û nedikir nikaribû dawiya wi bine. Lê dema ku wi qetandîna têlên kemança Lars Larsson bihist serê xwe bilind kir û bîhneke kûr kişande cigeran û dest pê kir li kemançê xist. İcar ew meqamê ku ewi ew çend sal bû nikaribû sererast bikira, niha bî awayeki zelal û hêsan derdixist, dî vê navberê da wi ji bî ahenga muzikê ra gavêñ xwe davet û berbi dêrê diçû. Û civata dawetê heta wê rojê meqameki weha nebihistibûn. Evi meqamê han ew civata qelebalîx dabû pey xwe û wîsa bî lez dîbir ku, qet bî careki nedîhate bira Nils Elofsson ku bisekine û bîhna xwe bide. Û hemû ji wîsa kîfa wan bî Jan Öster û Lars Larsson ra dîhat ku dema ketin hundîrê dêrê çavêñ gişkan bî hêşir bû.

*Wergerandin ji Swêdi: X. Lezgin*

# Destana Memê Alan û Şanoya "Mem û Zin"

*Wek tê zanin "Mem û Zin"  
şahesera hozanê me yê mezin  
Ehmedê Xani ye. Niha bî nav û naveroka vê  
destana evini ya manzûm, piyeseji heye. Ev piyes  
ji ali helbestvanê meyê hezkiri Eskerê Boyik va hatiye nivi-  
sandin. Salên çûyi piyesa Boyik, wek pirtûk di nav  
Weşanên Roja Nû da çap bû û gîhişte destê  
xwendevanan. Niha li Elmanyayê, ew ji  
aliyê şanogerên Koma BOTAN  
va tê pêşkêş kîrin.*

## DESTANA MEMÊ ALAN

Welatê me bî destê dijminan bûye koloni, li ser gelê me zérandin û çewisandînek gelek mezin her berdewam dike. Jî ber vê yekê çanda me ji aliyê zargotinê va pir dewlemend e. Wexta fesal ketiye destê Kurdan, zargotinê xwe bî usûleke edebi û li gor çaxênu tê da diji, kîrine nav nivisaran. Bî vi teheri gelek afirandinêngîranbuha pêşkêsi xelkê xwe û yên dînyayê kîrine. Jî ber ku hin me welaêt xwe rizgar nekîriye, gelê me azad nine, hin zehf tiştên zargotni nehatine nivisandin. Herusa her roj bî mirina kal û pirênu me, piraniya ew xezinê me ji tevi wana dîçine gorê, binax dibin. Lema dîvem bêwestan wana ji devênu pir, kal, dengbêj, qewlikbêjan kom bikin da ku hêj bî temami wînda nebûne.

Bêşik di nava zargotinê me da ciyê heri pêşin ê destana "Memê Alan" e. Ev destan hezar sal beri bûyina Isa pêxember heta niha di nav Kurdan da tê gotinê. Di seranseri Kurdistanê da

her bî devki tê gotin û stranê. Gor gotinêngîsporan, destanek wek a Memê Alan di nav gelên Ari da hebûye. Disa bî gotinê İrannasê Danimarkayi A. Christensen, beri bûyina Isa pêxember bî navê Chares de Mitylène niviskarek Yewnani, destanek wek destana Memê Alan

*Destana Kurdan a kevn û qedim  
Memê Alan, bî destê filozof,  
edib û mamossteyê mezin Ehmedê  
Xani bûye heykelek di nav çand  
û edebiyata me da.*

nivisiye. Usa diyar e ku, bingeha destanê disa di nav gelên Ari da bûye.

Cara pêşin A. Socin di sala 1890 da li Petersbûrgê, bî Elmani bî zaravê Botani ev destana han çap kîriye. Piştra qimeta wi hatiye ditin û di sala 1978'an da li İstenbolê li Tîrkiya wi va, disa di sala 1990 da li Elmanyayê li bajarê Kolnê tenê Kurdiya wê di nav Weşanxana Riya Azadi da hat weşandin. Roger Lescot eslê des-



### *Didemek ji piyesa "Mem û Zin"*

tanê ji devê du dengbêjan Mişo û Sebriyê Mîhacır girtiye û nîvisiye. Lî ser pirtûkê resmek pir ciwan ê memê Alan û Zina Zêdan bi temsili hatiye çekirin û pirtûk geleki bedew û xweşik kiriye. Jî ber ku her Kurd naveroka destanê dizane, Memê Alan, Zina Zêdan, Mir Ezin, wezirê wi yê fêlbaz û nebaş Bekoyê Ewan, herse bîra Hesen, Çeko û Qeretacdin û yên mayin nas dikin, ji ber wê yekê em ji behsa wan nakin.

### MEM Û ZIN

Destana Kurdan a kevn û qedim Memê Alan, bî destê filozof, edib û mamossteyê mezin **Ehmedê Xani** bûye heykelek dî nav çand û edebiyata me da. Xani ew destan bî usûleke edebî û wek şîr nîvisiye, ew afirandına bêhempa diyari gelê Kurd kiriye.

Aleksandır Jaba dî sala 1860 da lî Erzuromê li konsolosxana Ûrisan bûye. Jaba bî alikariya Melle Mehmûdê Bazidi destnîvisara Mem û Zinê bî xwe ra bîriye Petersbûrgê, li wîra dî kovara firansizi Mêlanjê Asiatik da kurtayıya Mem û Zinê çap kiriye. Ew berhemâ delal û tekûz heta niha bî gelek zimanian hatiye weşandinê.


Nîviskar û helbestvanê Kurd Eskerê Boyik ji ewi kiriye şanoyek xweşik. Ew şano dî sala 1989'an da dî nav Weşanê Roja Nû da bî tipê latini çap bûye. Ev şano 13 ê meha Tîrmehê li

bajarê Kolnê, ji aliyê şanogerîya BOTAN cara yekemin li sehnê hate leyistinê.

Dî dema Ehmedê Xani da, piraniya şair û nîviskar afirandinê xwe bî zimanê Erebi yan ji bî zimanê Farisi dînîvisin. Lê belê zanayê Kurd, pirtûk û nîvisarên xwe bî zimanê Kurdi dînîvisi, sebebê wi kari ji weha diyar dîkir:

*"Da xelq-i nebêjîtin ku "Ekrad"  
Bê merifetin, bê esl û binyad  
Envaê milel xwedan kutêbin  
Kurmanc-i tenê dî bê hesêbin"*

Bêşik li gor wê çaxa ku Ehmedê Xani jiyaye, gelek bêjeyên Erebi û Farisi ji ketîne nav afirandinan, her usa dî nav pirtûka Mem û Zinê ji ew kelime û gotinêni biyani henin. Lê, ewana qiyemet û bîlindiya wê berhemê kêm nakin. Dema ew berhem kete nava literatura cihanê, hat ditin ku wek Romeu Julietta Shekspir, mina Şehnâma Firdewsi, wek Leyla û Mecnûna Nizami giranbuha ye. Bî şkil û şemal, bî qafîye û rîzkirina hevokan berhemek klasik e, lê ne wek ên sade, klasikeke tekûz û edebî ye. Bî gotinek din ew tişt tesirê afirandinê ji aliyê estetik nekiriye. Qalkırına bûyer, salixdana mîrov û rewşa mîrovan va insan dikare bêje ku pir dewlemend û xweşik e. Ehmedê Xani, ev destana evindariyê, bî rasti bê gotinê ji xwe ra kiriye arone (bahane) derd û kulê xelkê xwe û



*Niha endamê Koma Şanogeri ya BOTAN xwe amade kirine ku vê payiz û zivistanê, li Ewrûpayê, li gelek cihan vê şanoya bî nav û deng raxine ber çavên temaşevanan.*

welatê xwe di vê eserê da anije ser ziman. Qelsi û camêriyê nişanê xwendevanan kiriye. Daxwazên xwe û yê gelê Kurd baş nişan daye.

## ŞANOYA MEM Ü ZİNÊ

Nîvîskarê hêja Eskerê Boyik ji ev destana nemir kiriye şanoyek xweşik û delal. Li Ermenistanê xwestine evê tiyatroyê bilizin lê ji ber hîn tengasiyan nekaribûne biqedinin. Li Kurdistanâ Iranê ji şanoya Mem û Zinê nehatiye leyistin. Di Kurdistanâ Iraqê da ji gor agahdariyên min şanoyek weha li sehnê nehatiye danin. Niha em dikarin bêjin ku cara yekemin e şanoya Mem û Zinê di diroka Kurdistanê da weha bî rêk û pêk hatiye leyistinê. Lema qiymeta vê şanoyê gelek e.

Koma şanogeri bî navê BOTAN li Elmanyayê wextek dûr û dirêj e ku li ser vê şanoyê xebatê dike. Kom, komeke profesyonel nine, ewên kar dîkin xên ji Ferhedê Feqi gişk xwendevan an ji karker in. Dijwariyek din li ber şanovanan ji ew bû ku, şanovanen keçik an qet an ji pir hindik Kurdi dîzanibûn. Ji aliyê cil û bergen ewqas zehmeti çênebû, lê disa ji li gor çaxê Mem û Zinê kostum ditin, geleki çetin bû. Gava mirov astengên jorin dînihêre, mirov bawer nake ku ewqas şanoyek delal ew şanovan derxîn meydanê. Lê bî rasti ji ewana diji hemû bê imkaniyatan, pir baş leyistin, temaşevanan kiriye nav xewnek xwes û ew heta dawiya şanoyê ji xewna şirin û xweşik hisyar nebûn.

Bêgotin temamiya şanoyê leyistin zehmet e, him ji wext pir divê. Lema ji di navbirêñ sehma

guhurandinê da, hunremendê xweşdeng û dilsoz Said Gabari kılama Mem û Zinê distra, ciyên ku ji aliyê şanovanan nedihate leyistinê bî kîlam tiji dikir. Lema dibêjin ku temaşevan her di xewnê da man ta ku şano qediya. Bî deqiqan li ser piyan temaşevan, bo şanovan û ewên ku keda wana tê da henin cepikan lêxistin. Rabûna xwe bî wi teheri aşkera kîrin.

Rejisörê ciwan lê zirek û têghiştî Ferhadê Feqi, bî rasti bî rojan, bî mehan hevalên xwe gîhand, bî wan ra bî saetan xebat kîr û gîhişte mirazê xwe. Niha ewana xwe amade kirine ku vê payiz û zivistanê, li Ewrûpayê, li gelek cihan vê şanoya bî nav û deng raxine ber çavên temaşevanan.

Di şanoyê da rola hemûyan li gori laş û gewde, şikil û şemala wana nebû, bî gotinek din Memê yeki bejin kurt, Zinê anegori Memê dîrêj, ji hersê birayan Çeko û Qeretacdin anegori Hesen bejin kurt bûn. Salon gelek teng û hewa baş nedîstand. Lê amadekariya şanovanan, rîkûpêkbûna sehneyê û mijara piyesê, me ew kîmasiyêñ heyi ji neditin.

Koma BOTAN dixwaze ku, barêñ xort an keçen ku çend rolan bî hevra dîlizin kêm bike û hevalên nû peyda bike. Da ku bikarîbin hin baştır û hêsanî bilizin. Ji aliyê din va, ji bo salonen baştır û firehtir ji ewana xebata xwe dîdominin.

Endamê Yekitiya Nîvîskar û Hunermendêñ Kurdistan li Elmania, hemû Kurdêñ dilsoz û welatparêz ji Ferhedê Feqi û hevalên wi yên jêhati û hêja ra serketman daxwaz dîkin. Bî wi kari va ewana çanda me dîdin nasin, ji windabûnê xîlas dîkin û me hemûyan serbilind dîkin.

## *Biro BILINDÇI*



## KONFERANS NAVNETEWI YA KURD LI BONNE

Bı qasi 300 berpirsiyar û nûnerên hêzên Kurd, alîm, pîspor û berpirsiyarên dewletên biyani besdari konferansê bûn. Lî ser çareserkirîna pîrsa gelê Kurd, ditin û pêşniyarên xwe pêşkêş kîrin. Dî dawiya konferansê da gelek bîryarêng gîring hatin girtin. Yek jî wan avakirîna *Komela Nvnetewi ya Mafêñ Mirovi ji bo Kurdistanê* bû. Dî damezrandîna vê komelê da lî ser 60'i kesen siyasi, alîm, nîvîskar û hunermend besdar bûn.

# "Dîvê gelê Kurd bigihije mafê xwe yê çarenûsi"

N. Koçer

Roja 27-28 ê meha llonê li paytextê dewleta Elman li bajare Bonnê, bî navê "Gelê Kurd: Heta mafêñ mirovi nebin, pêşeroj nabe" konferansek navnetewi çêbû. Konferans bî navê hukûmeta Saksonyaya Jêrin û "İnsiyatifa Mafêñ Mirovi li Kurdistan" amade bû. Dî bin çavnêriya Wezirê Saksonyaya Jêrin ji hate parastin. KOMKAR (Federasyona Komelê Karkerêne Kurdistan) û Medico Enternasional piştgiriyyek xurt dane vê Konferansê. Bı qasi 300 berpirsiyar û nûnerên hêzên Kurd, zane, pîspor û berpirsiyarên dewletên biyani besdari konferansê bûn. Gelek zana, pîspor û alîm li ser çareserkirîna pîrsêng gelê Kurd bî xurti sekînîn.

Konferans bî axaftina Serokwezirê Saksonyaya Jêrin Gerhard Schröder hate vekîrin. Gerhard Schröder dî axaftina xwe da lî ser pîrsêng gîring û pêşeroja gelê Kurd gelek sekîni. Giraniya axaftina xwe da ser helkirîna mafêñ mirovi, demokrasiyê, nermbûna cihanê û mafêñ gelê Kurd ên çarenûsi. Dî dawiya xeberdana xwe da got: "Em nikarin mafêñ gelê Kurd ên netewi



Demek ji konferansê . Foto: Heide Reiss

nebin û mafêñ çarenûsi bavêjin pişt guhê xwe".

Gelek gotarvanêne wek Jürgen Trittin (Wezirê Parlamentoya Ewrûpa yê Elmanya Federal), Dr. Peter Jankowitsch (Sekreterê Serokwezirê Awusturya), Ann Clywd (endamê parlamentoya Ingiliz), Dr. Doeke Eisma (ji Konseya Ewrûpa bî navê Komisyona Penaberan), Prof. Dr. Johann Galtung (lêkolinvanê aşitiyê-Norveç), bir û baweriyêng xwe gotin, dûr û dîrêj li ser pîrsa




### *Komek ji damezrandarêñ Komela Navnetewi Ya Jî Bo Mafêñ Mirovi Li Kurdistanê*

Kurda sekînîn û di gotarêñ xwe da "Bila ev zor û zulma han zêde dirêj nebe, bila rojek zûtir were sekînandin. Ev taribûn pîrsa Kurdan bîncîl dîke, bî alemê nadî nişandanê. Eger dewletêñ dînyayê bixwazin, karin mesela Kurda bî rîyek aşiti çareser bikin. Pêwist e ku mîrov di warê navnetewi da lî ser rîyek edlahi û siyasetek bingehin bisekîne."

Lî ser navê hêzên Kurdistanê, berpîrsiyar peyîvin. Bî navê Eniya Kurdistanâ Iraq-Kemal Fuad, berpîrsiyarê Partiya Demoqrat a Kurdistanâ Iran-Fetah Abdulli û jî Partiya Sosyalist a Kurdistanâ Tirkîyê- Kemal Burkay.

Sekreterê Gîsti yê Partiya Sosyalist a Kurdistanâ Tirkîyê Kemal Burkay, di axaftina xwe ya Kurdi da lî ser çareserkirina mesela Kurdan dûr û dirêj sekîni. Burkay, jî bo rewşen dawi û mesela kurda weha got: "Dî salêñ çûyi da dî derheqa pîrsa Kurdi da bêdengiyek mezîn hebû. Niha ew bêdengi gelek şikiyaye. Gelên dînyayê êdi hayê wan jî pîrsa kurdi heye. (...) Anglo pîrsa Kurdi tenê pîrsike mafêñ mirovi ye, yan tenê pîrsike hindikayi ye? Lî dî axaftinêñ resmi da, yan jî dî civinêñ navnetewi da, wek li Saziyên Miletên Yekbûyi, dî civinêñ Helsinki da, nûnerên dewlet û hukûmetan, yan lî gor adet û usûlîn berê dî derheqa pîrsa Kurdi da bêdeng

dîminin, qet navê wê ji nastinîn ser zimanê xwe yan jî vê pîrsê tenê wek pîrsike "mafêñ mirovi" yan jî "hindikayi" nişan dîdin û dî vê çarçovê da jî bo Kurdan hin heq û azadiyan dixwazin. (...) Rast e, kurd iro dî van welatan da, angó dî welatê xwe yê parçebûyi da, xwedan heq û azadiyêñ hindikayiyan e, xwedan heq û azadiyêñ bîçûk jî ninin. Ev yek nişan dîde ku çawa zordestiyeke mezîn li ser Kurdan heye. Lî ali din, em ne hindikayi ne, em mîletek in. Welatê me bî zorê hatîye parçekirin û pîrsa Kurdi pîrsike netewi ye. Û dîvê di vê çarçovê da bê safikirin. (...) Anglo ez, jî bo safikirina pîrsa Kurdi, rê û esasê bingehin nişan dîdim. Ew jî heqê çarenûsi ye. Weki hemû milletan ew jî bo Kurda jî heq e".



*Gerhard Schröder*



*Ibrahim Aksoy*



Jurgen Trittin



A. Clywd



Fettah Abdulli

Roja duyemin ji qisedarê konferansê li ser giringiya pîrsa Kurda sekînîn, diji dewletên zordar bir û baweriyêne xwe gotin û rexne kîrin. Wek: Hans Koschnik (parlamente Û SPD ê Elmanya), Claudia Roth (parlamente Û Partiya Keskan û endamê Parlamento Û Ewrûpa), Ibrahim Aksoy (parlamente Û serbîxwe ji Tirkîyê), Ahtonis Tritsis (Serokê Belediya Atina) Tove-Kari Viken (parlamente Û Norveç), Prof. Ove E. Bring (Pisporê Wezareta Derva yê Swêd), Prof. Bimal Ghosh (Koordinatorê Milletên Yekbûyi yê liqê başûr û bakûr-İsviçre), Björn Elmquist (di Peymana Helsinkiyê da Serokê Federasyona Mafêni Mirovi û Serokê Konseya Ewrûpa yê partiyê liberal), Andrew Whitley (di Komita Rojhilata Navin da berpirsiyarê liqê Helsinkiyê), Skutnabb-Kangass, Tove Phillipson, Robert (ji Zaninge-ha Danimarka ya zimanziyê) û Prof. Nadir Nadirov (ji Sovyetê).

Xên ji van kesên jor, gelek berpirsiyarê mafêni mirovi û yên netewi ji hatibûn. Ji her çar parçeyê Kurdistanê, ji Tirkîyê, parlamente Û Ewrûpa, berpirsiyarê eyaletên Elmanya, Finlandiya, Norveç, Swêd, Hollanda, Qîbris, Yewnanistan, Bulgaristan, Polonya, Ispanya û Amerika.

Digel vana bi sedan kes (serokê parlamento Û, wezir, ronakbir, alîm, niviskar) mesaj şandibûn konferansê.

## Biryarê Konferansê

Di dawiyê da gelek biryarê giring hatin girtin. Daxuyaniya biryarê konferansê ji bo gelê Kurd bû gaveke giring. Herweha li dewle-

tên dagirker (Tirkîyê, Iraq, Iran û Sûriye) rexne hatin kîrin, bir û baweriyêne besdarê konferansê bi vi awayi hatin diyar kîrin:

- Divê ji bo gelê Kurd mafêni çarenûsi li ser bungehê serbestiyê were qebûlkîrin.
- Divê ger û terora diji gelê Kurd bête rawestandin!
- Divê gelê Kurd ji cih û warêne xwe neyê qewirandin, gund û çiyayê wan neyê wêrankîrin!
- Divê li gor Peymana Helsinkiyê, axaftina Kurdi bi fermi were qebûlkîrin!
- Divê êşkence were sekinandin, girtiyê politik werin berdan û herçî kesen ku ji welat hatine avêtin, cardin vegeerin welat!
- Divê dewletên zordar, leşker û polêsên xwe ji Kurdistanê bikşinin!
- Divê Waliyê Navçê yê Giştî rabe.
- Divê Parti û hêzên Kurd bi rayeki azad bêñ sazkîrin!

Herwisa ji Konferansa Bonnê ji bo mafêni Kurda yên çarenûsi, mirovi, demokrati û hwd. bangi rêxistinê navnetewi yên wek Millîten Yekbûyi, Rêxistina Civata Ewrûpa, Komisyonâ Ewrûpa û berbirsiyarêne dewletan kir da ku alikariya gelê Kurd bikin, mafêni gelê Kurd ên hundir û dervayı welat biparêzin, kiryarêne dewletên dagirker protesto bikin û ji bo mafêni gelê Kurd di Rojhilata Navin da konferansek duyemin bicivînin.

Konferansa Bonnê ji bo kar û barêne navnetewi ji, gaveke giring avêt. Bi navê "Komela Navnetewi Ji Bo Mafêni Mirovi Li Kurdistanê" komeleyek saz kîr.

# STRANÊN SERHILDANA AGIRİ

## 1

Gelê Kurd, 60 sal berê, di nav şerê azadiya xwe ya mîletiyê da ev stranên han hûnandiye. Ìro ji ew li welatê me, bî taybeti li bakûrê Kurdistanê, li ali Serhedê ji ser lêvên dengbêjan kêm nabin. Ewana, him wek parçeki diroka me ya nêzik û nenwisandi, him ji wek edebiyata gel, hêjayi parastinê ne. Berhevkirin û weşandina wan wê ji dirok û çanda me ra bibe xizmeteke mezîn.

Di wan da, gelê Kurd, di şerê diyi dewleta Türk da, ango di Serhildana Çiyayê Agiri (Gridaxê) da, şervaniya lawên xwe yêñ mîrxas distirê; zulm û bêbextiya Romê distirê.

Heval A. Bazidi, ji bo weşandinê gelek ji wan stranan berhev kirine. Di vê hejmarê da, em dest pê dikin wan diweşinîn.

**Redaksiyon**

**Berevkar: A. BAZIDI**

### ŞÊX ZAHİR

Ji gotina dengbêj Şakiro

Wayê rebenê, tixûbê Iranê wê li hember e  
Hela bala xwe bîdê dayê, min ê li sibê Xwedê da  
li ber çavê kekê min dayê, dûrbîn e,  
li destê Şêx Zahir, berxê mala Baban xerite ye,  
birao min ji te ra nego, neçe pêşıya te  
top û tekerlek û axır makine ye,  
sê tabûr eskerê tîrkan,  
lawo vê sibengê pêşıya te ye,  
keseki xêrxwazi xêra tune,  
cabekî bîde kîrê Celaliya, bêje:  
"Şêx Gîyaseddin, belki mala te mirat be  
derbek lêxistîne, bejna Şêx Zahir, delalê malê  
birina berxê mala Baban,  
kûr û xedâr e, bê fayde ye."  
Lê lê herê rebenê, rabe sibe ye  
Şerek çêbû, li Şehidê Gazê, li tixûbê Iranê  
payiz e, berf dîbare, dayê çiqasi nerm e  
bîra li rûyê erdê ser me kiriye, minani çerm e,  
eskerê sê hew wilayeta giran  
ji êvara xwedê da, dayê hate ser me  
Min di Şêx Evdîrehman gazi kîr  
Şêx Zahir tu nereve,  
rev ji mala me ra çiqasi bêji ewqasi şerm e.  
Go: "Hey mala te mirato!"  
Haya te ji birina bîrayê te tune,  
topê li ser tiliya min xistiye,  
hela rabe, qutiya minê cixarê,  
ceba min derxe, cixareki ji min ra bipêçe  
bila bîrayê te bikişine,  
hê bîrinê canê min germ e.

cabekî bîde kîrê Celaliya, bêje:

"Şêx Gîyaseddin, belki mala te mirat be,  
derbek lêxistîne, bejna Şêx Zahir, delalê malê  
min rebenê, kuştîne, firarê navbeyna sê dewle-  
ta."

Lê, lê herê rebenê, sibe ye  
Şerek çêbû, li Şehidê Gazê, li tixûbê Iranê  
payiz e, berf dîbare, dayê çiqasi nerm e  
bîra li rûyê erdê ser me kiriye, minani çerm e,  
eskerê sê hew wilayeta giran  
ji êvara xwedê da, dayê hate ser me  
Min di Şêx Evdîrehman gazi kîr  
Şêx Zahir tu nereve,  
rev ji mala me ra çiqasi bêji ewqasi şerm e.  
Go: "Hey mala te mirato!"  
Haya te ji birina bîrayê te tune,  
topê li ser tiliya min xistiye,  
hela rabe, qutiya minê cixarê,  
ceba min derxe, cixareki ji min ra bipêçe  
bila bîrayê te bikişine,  
hê bîrinê canê min germ e.

### ŞÊX ZAHİR EFENDÎ

De wi lo lo, wi lo lo, wi bavo

De dayê rebenê, şerekê li me qewimi  
 Belekê Gilidaxê, qûntarê çiyê  
 Qaleki li me qewimi li belekê qûntarê çiyê  
 Dengê topan û teyaran li ser me  
 Têne fêza vê belekê  
 Ax way li min wayê  
 Ax way li min wayê  
 Heyla min korê qe nemayê  
 Rûbar û axa te dînyayê  
 Hetani sax bim  
 Kula eşira gîran  
 dilê min dernayê.

Ax way li min wayê,  
 Ax way li min wayê, min nemayê  
 Şêx Zahir efendi bi sê denga kire gazi, go:  
 We ocaxi gîran e, çawa keseki tunine,  
 Caweki bibe hewarê vê komekê,  
 De mala dê û xwişka bışewite,  
 Bila bê ber serê lawê eşiretê,  
 Bêje qaydeki vê Ezmiyê,  
 De bila destmalê hilde,  
 Xwina sor temiz ke pêş eniyê.  
 Ax way li min wayê  
 Ax way li min wayê  
 Heyla min korê qe nemayê  
 Rûbar û axa (avata) te dînyayê  
 Hetani wez ê sax bim  
 Kula hêsiрия qiz û xortê eşirê  
 Dilê min dernayê.

Ax de wi lo lo, wi lo lo, wi bavo  
 De dayê rebenê, şerekê li me qewimi,  
 Beleka Gilidaxê wê li hember e,  
 Qaleki li me qewimi,  
 Beleka Gilidaxê wê li hember e  
 Erê hêsiře hezar heftsed  
 Eskerê vê contirkê kışyaye  
 Lî ser eşiretê bi top, bi qûmpare  
 Ax way li min wayê  
 Ax way li min wayê  
 Heyla min korê qe nemayê  
 Rûbar û avata vê dînyayê  
 Hetani sax bim  
 Kula eşira gîran  
 Dilê min dernayê.

Ax de wi lo lo, wi lo lo, wi bavo  
 De dayê rebenê, şerekî li me qewimi

Beleka Gilidaxê li devê pirê,  
 Qaleki li me qewimi,  
 Beleka Gilidaxê li devê pirê,  
 Wez ê dinihêrim destê lawê di eşirê,  
 Stuya da makine,  
 destâ da tomatikê dor bi kin e,  
 Xwedê we mîr dîzane,  
 Isal çend salê lawê eşiretê  
 Beri eskerê Romê dane,  
 Walgerandine ser qeza vê İdirê.  
 Ax way li min wayê  
 Ax way li min wayê  
 Heyla min korê qe nemayê  
 Rûbar û avata vê dînyayê  
 Hetani sax bim  
 Kula hêsiřia qiz û xortê eşirê  
 Dilê min dernayê.

Ax de wi lo lo, wi lo lo, wi bavo  
 De dayê rebenê, şerekî li me qewimi,  
 Beleka Gilidaxê vê adrêse  
 Qaleki li me qewimi,  
 Beleka Gilidaxê vê adrêse,  
 Du hezar-heftsed  
 eskerê van contirkâ birine,  
 Pişta xortê eşirê li vê xetê  
 Şêx Zahir efendi bi sê denga kire gazi, go:  
 Bila mala bavê dê û xwişka bışewite  
 De bila bêc cinyazê lawê eşiretê  
 Bîkşine padvanê vê Bazidê  
 Ax way li min wayê  
 Ax way li min wayê  
 Heyla min korê qe nemayê  
 Rûbar û avata vê dînyayê  
 Hetani wez ê sax bim  
 Kula hêsiřia qiz û xortê eşirê  
 Dilê min dernayê.

### KEREMÊ HEMO

(Geliyê Zila) - Jî dengbêj Keremê Kor

Lî min hayê, de Gulizarê bihar e  
 Birindarê mala bavê min, deng li hev kîr  
 Dilê min û halê min, gelo temam xîrab nekîr,  
 Çûme wîrataza heta erdê Erdişê,  
 Min go: Tu Keremê Hemo yi,  
 kîlê çavê Sêvê, bavê Seyranê, kekê Nafiyayê,  
 Lawo danzdeh sal cezayê te bû,

Eva çi derman e, te simêlê xwe kîr?  
 G: Apo, danzdeh sal cezayê min bû,  
 min ra danzdeh roj e,  
 Qet ber çavê min pere nekir.  
 Bîdilisê Gewer efendi mala xwe şewitand,  
 gelo hat lî vira derbas bû,  
 Tanek da min, çiqas min eser kîr,  
 Xeyfek min ji hêşirê Geliyê Zila vekir,  
 Giliyê mîrikê koti lî min eser kîr.

Axao çûme heta Erdîşê bilîndciya,  
 Çûme aşê da, pira Heyder Efendi, nav girtiya  
 dermaneki wi ra çêkiriye,  
 ji misqalê, derhemê, ji kevçiya,  
 seri lê kîr heta qomçi pêçiya.  
 Çawa jehravin bîrinê simêlê wi  
 ta bî ta bilîndciya.  
 Wexta Keremê Hemo kuştin, nîzanîm  
 koka hêşirê Geliyê Zila me qeliya bîraooo...  
 Heft salê Erdîşê dexirme ye,  
 iya aşê wan sosin bî caxde ye,  
 hey hukumetê ser cînyazê Hemo lî hev civiyane  
 dibê Keremê Hemo rake vi ali giha ye,  
 heyfa min li ser hêşirê Geliyê Zila gelek maye.  
 Lî min lê wayê, korê nemayê,  
 Mala Dewrêş Begê nava mala dayê,  
 Dî singûya ketiye,  
 nava hêşirê Geliyê Zila, na, dernayê,  
 Ez ê bî çavê hêşir, dilê şikesti çûme koka dara,  
 nale nala hêşirê Hemo ye, birango xewa min  
 nayê.

### JI SERJÊKIRINA GELIYÊ ZILA GOTINÊN KEÇA KURD (HACÊ)

Dayê dayê dayê dayê dayê  
 Hacê bang dikir Husno, Feride!  
 Lawo sibe ye qalek çê bûye iro  
 Lî ser eşira Geliyê Zila  
 Warê Salih Begê, Zozanê Sûtê, Kaniya  
 Didarê lî delavên heri jor lawo  
 Ez pepûk bîm lawo nîzam ji bo çi bû  
 Kê bûn û kê û kê kîr?

Kula xwedê bî kul be lawo  
 Têkeve mala doqizinci alayê  
 Firqa aliyê Bazidê, Dewrêş Beg tê da ye  
 Mihemedê Hesê, Heci Eli  
 Iro lî kavîlbûya sarisûyê  
 Şêx Tahir hildaye rûniştin  
 Dayê di heqê Geliyê Zila da  
 Ez hêşir bîm dayê, fesadi dikir.

Heyfa min nayê li qira Geliyê Zila  
 Lî kuştina taz-oxlanê, mala Şero bavê Mîzefer  
 Dewrêş Begê urt û ocaxê xwe li dînyayê qelandi  
 Lawo derbek lî taz-oxlanê mala Şero bavê  
 Mîzefer daye  
 Ez hêşir bîm ji bona gustila zêr  
 Tîliya Üsiv Begê delali dî ber da jêkir.

Hacê bang dikir Husno, Feride  
 Lawo sibe ye qaleki çê bûye iro  
 Lî ser eşira Geliyê Zila  
 Warê Salih Begê, Zozanê Sûtê, Kaniya Didarê  
 Lî delavên heri jor lawo  
 Ez pepûk bîm lawo nîzam ji bo çi bû  
 Kê bûn û kê û kê kîr?

Kula xwedê bî kul be, têkeve  
 Mala doqizinci alayê  
 Firqa aliyê Bazidê Dewrêş Begê te da ye  
 Mihemedê Hesê, Heci Eli lî kavîlbûya  
 Sarisûyê Şêx Tahir dane pêşiyê  
 Jî êvar da ez hêşir bîm lawo  
 Devê topa û tometika makîneliyan  
 Lî hêşîren Geliyê Zila girêdane.

Heyfa min nayê li qira Geliyê Zila  
 Lî kuştina taz-oxlanê mala Şero, bavê Mîzefer  
 Dewrêş Begê urt û ocaxê xwe li dînyayê qelandi  
 Lawo hezar û pêncsed nîfûsên Geliyê Zila  
 Jî êvar da kom kiriye, lawo bîriye  
 Lî orta Kêzmûk û mîlkê dî nav da  
 Kire quesabxane hêşir im wayê, wayê, wayê,  
 wayê.

Hacê digot Husno, Feridê lawo  
 Ez neminim iro ji kê ra nîzam  
 Iro bigrim, ji halê kijan eşirê ra  
 Ez neminim ji hêşîren Geliyê Zilan ra  
 Sêses qiz û bûkên Geliyê Zila  
 Kîrin makinan, şandin nav dewêlan  
 Lawo belkê felek mala te mirat be  
 Kê gazında ji te bike, ji te ra digotin  
 Hacê, Husno, Feride hersê xweyingan  
 Sax bin lî dinê, dî binê cendekan da  
 Jî derdêñ dînyayê ra lawo ax ku ax...  
 Ez ê iro ji bona xelkê Geliyê Zilan  
 Dayê bêjim hêşir im, hêşir im, hêşir im,  
 Hêşira taz-oxlanê mala Şero, bavê Mîzefer  
 Gula xorta me felekê hey wêl, wêl, wêl, wêl...

**(Dewam dîke)**

# Lihevanin

(BEND-DILOK)

Berevkar: Bavê Zinar

Bûkek ani ji Gimgimê  
Daweta wê kîr bî def û zîrnê  
Bûk rînd e aqîl kêm e.

Bûkek ani ji Elegez  
Qelendê wê hezar pez  
Bûkê em kîrin merez  
Gula malê disa ez.

Ez reş im bîha nakîm  
Biçim ser qelaçiya xwe qela kîm  
Qimeta xwe bîha kîm.

Keça xwe nadîm tu gunda  
Didîme dewlemenda  
Bîla jê ra bîkîrin bazînê zenda  
Ku pê biçe govenda.

Leylê çûbû zozana  
Çelek anîbû dana  
Mêrik du dar lêxistin  
Jî bo kofi kitana.

Lîlê lîlê keçikê  
Destmala çarnîçikê  
Xal xezûr, mîr kûçikê.

Lîlê keçê rîndikê

Keçik çûye mendikê  
Min paç kîr bin qırıkê.

Lîlê kejê kejinê  
Çavresê pozpijinê  
Min kejê xwest nedan min  
Dane lawkê Mêrdinê

Lîlê reşê reşkeverê  
Zêra berde ser kemerê  
Dilê xorta temam li serê.

Lîlê zerê zerinê  
Sûretsurê renginê  
Çavresê dilhebinê.

Li ser bana ban dikim  
Paşik tiji dan dikim  
Pê daweta xwe dikim  
Rûn tune av lê dikim.

Li def û zîrnê xîstîn  
Qemerê ji mal derxistin  
Destê wê bî destê min xîstîn.

Lolo kuro kurê pirê  
Jî mal derket çû nêçirê  
Nêçir kuşt avête birê.

Lolo lawo dor bı dor  
Lı piştê kemera sor  
Dê xanım e bavi tol.

Lolo lawo çavreş i  
Dayka xwe ra çı xweş i  
Bavê xwe ra zebeş i.

Lo xwediya te daye  
Şapık ser şal da berdaye  
Dil ketiye qizmetê  
Metê darek lê daye.

Lo xwediyo te minet  
Gul barine xet bı xet  
Gula rind para mın ket.

Mêvanê mın i Türk e  
Vedike bendê kurk e  
Sê beroş dew fir dike  
Hela dîbê hindik e.

Peyak hate nav êlê  
Xezal rûnişt ber sêlê  
Jinik bı qurban bibe  
Xala reş lı simêlê.

Qiza mın Zina zer e  
Zêr bikşine beranber e  
Hê hezar pez lı ser e  
Ki dixwaze pêşda were.

Qiza mirê serayê  
Nav gunda da geriyayê  
Çarix gore qetiyayê  
Kesi nanek nedayê.

Qiz im qiza vi beri  
Siyar hatin ber deri  
Hemi bûne muşteri.

Qurban bibim sê cara  
Jê ra tinim sê yara

Yek vedike doxinê  
Yek dikeve kulinê  
Yekê ser deva rûnê.

Rindê tê ji derda  
Qotik ser kofiyê da berda  
Xort tev rabûn ji berda.

Şivano hike mîke  
Gazi miha qer dike  
Elbê tiji şir dike  
Hêdi hêdi fir dike.

Tu mirê nav miran i  
Beranê nav keriyan i  
Peyayê dû zeriyan i.

Xwezgini sed û si ne  
Dî malê da rûniştı ne  
Xwezginiya qebûl nakım  
Hemi ti û birçi ne.

Xwezila şerek derketa  
Hesikê mın nav keta  
Şûr lı milê rast keta  
Hewar lı birê daketa.

Xezalê çêlek dötin  
Kîlamê xweş digotin  
Dil-cigerê mın sotin.

Wi xwedayo te daye  
Zerê bin da pal daye  
Beko jinê berdaye  
Xesiyê ji kerba rih daye.

Zina mın çavhêşin e  
Nav gunda da xwe dîhejine  
Çûbû kaniya Qodaxa  
Ji bavo ra avê bine.

# BEREVOKA TERMAN

## TERMÊN COXRAFI

Welat  
 Dewlet  
 Hukûmet  
 Parlament  
 Paytext, serbajar  
 Bajar, şar, şehr  
 Wilayet  
 Belediye  
 Bajarak, şaroşke  
 Nehiye  
 Gund  
 Gom  
 Mezra  
 Navçe, herêm  
 Dever, der, cih, şûn  
 Ali, hêl; hewirk  
 Tax, tar, gerek  
 Kolan, şeqam, cade  
 Kuçe, zikak  
 Hawirdor, derûdor, dorber, dormedor  
 Per; qerex, kêlek, kenar

Derya, behr  
 Gol  
 Gom, gomik (golên biçük)  
 Çem, çom  
 Rûbar  
 Kani  
 Çavkani  
 Bir  
 Çiqılçem, zireçem  
 Tavgeh, şip  
 Şip, şirşar; lêjaw  
 Co, cuh, coge  
 Cok, kanal  
 Lehi, lêmişt, laser, sêlav, lafaw, lêke  
 Gîrav; dûrge  
 Nivgîrav  
 Komgîrav; komelêk dûrge  
 Delav, kendaw, xeliç  
 Perav, xerexê derya, qerexê avê  
 Zik (ji bo avêñ çem û deryayan ên zikdayî ra tê  
 gotin)  
 Poz  
 Bender, liman  
 Îskele, skele  
 Buhura keştiyan  
 Pêl, şepol  
 Pêlbir, pêlşikêñ, şepolbir  
 Sekûyê avê  
 Bendav  
 Pîr, pire, pird  
 Ciya, şax, koy, kêw  
 Zencireciya  
 Geli  
 Firinek, zerif, zere  
 Zozan; ciya  
 Gir, top, tepe  
 Navser, sertar, serger, serişax  
 Newal, dol  
 Buhur  
 Zuxur  
 Deş, deyşt

Rast, best, berri  
 Kaş, hevraz, serejor, pal,  
 Berpal  
 Berwar  
 Gaz  
 Berroj  
 Serejér, serbijér, serberjér  
 Quntar  
 Şikeft  
 Berqef  
 Rê  
 Carrê, xaçerê, çaterê. çaryan (ciyê ku du rê hev-  
 du xaçki dibîrn)  
 Sêrê  
 Durê, duryan  
 Hesînrê  
 Otorê  
 Şiverê, şivile; şivanrê  
 Korerê  
 Getekrê  
 Averê  
 Tunêl  
 Zevi, erd  
 Şûv, şov  
 Mêrg  
 Beyar  
 Axpin  
 Çeregeh  
 Daristan; rêl, dehl  
 Devi, teraş, dewe  
 Dar, dirext  
 Bax  
 Bostan, bistan  
 Rez  
 Baxçe  
 Sinor, tixûb  
 Hesin, asin  
 Gûhesin  
 Pola, mifirq  
 Çinko  
 Bafûn, aliminyûm  
 Birinc, zerd  
 Bronz, tûnc  
 Sıfir  
 Risas, gulle, qurqusum  
 Lihêm, qela  
 Riji, reji, xelûz, komir, zuxal  
 Zér  
 Ziv, zêw, sim  
 Almas, elmas  
 Gewher  
 Kariban  
 Berf, befir  
 Zipik, teyrok, teriz, terze  
 Xîlorik, gîlêrc, savarok  
 Şelape, şilope (berf û baran bi hevra)  
 Baran, şili  
 Xunav, avi  
 Xusar  
 Hiskahî; sayı  
 Xweşi



## QUNCIKÊ ZAROKAN

ROK ÇIROK ÇIROK ÇIROK ÇIROK ÇIROK ÇIROK ÇIROK ÇIROK ÇIROK Ç

# Hepûnê

C arekê ji caran gurek hebû, navê wi Hepûnê bû. Hepûnê dî cîwaniya xwe de pîr jir û jêhati, merd û mîrxas bû. Wi tîm pêşî dîkîşand, êriş dîbir ser keriyên pez, garana ker û dewaran. Lî pîr bî hesab û plan bû. Ji ber van çalakiyên wi yên hêja, nav û dengê wi li çar aliyê çol û çiyayan, deşt û newalan, bajar û gundêñ wi welati bî qenci belav bûbû.

Lî sal derbas bûn û Hepûnê pir bû. Nema karibû wek demêñ berê ne mîrxasi ne ji qenci bikira. Qewet û taqeta wi ji nema bû. Çaxê dîket kîleka ke-riki pez, kûçikêñ şivanan pê dîhesiyan, êriş dîbirin ser û wi perişan dîkirin.

Rojekê Hepûnê dî nav deviki de birçi û bîrindar mexel ketibû. Dit ku wa gureki cîwan dî çax û benga xwe de hîme hîma wi ye û berpê de tê. Gurê cîwan nêzi

Hepûnê bû. Sîlav lê da û sekini, paşê pîrsa hal û wextê vi gurê pîr û birçi kîr. Çaxa nas kîr ku ev pîrê han Hepûnê ye, pîr kîfx-wes bû. Ji ber ku bav û kalê wi jê ra qala Hepûnê kîribûn. Gurê cîwan rabû ser xwe û got:

- Bêje Apê Hepûnê, te çi dîbê?

Hepûnê:

- Xorto wek ku tu dîbini, ez birçi û bîrindar im.

Gurê cîwan:

- Qet xema nexwe, nîha ez dîherim û ji te ra beratan dîkim kom û têm.

Wextê Gurê cîwan kîr ku here, Hepûnê gazi wi kîr û got:

- Xorto li qusûrê menêre, gelo tu ji kijan qulê û kijan dîlê yi?

Gurê cîwan:

- Apo, ez ji qula berroj û dêla belek im.

Pîşti xortê me çû, Hepûnê bav û kalê wi ani bira xwe ku ew tol bûn. Lî wi hêvi kîr ku xort ne wek wan be.

Pıştı qedereki Gurê cıwan xwe gıhandıbû nêzi keriki pez û bî careki xwe davê nav keri. Kûçikêñ şıvana zû lê hay bûn û berdanê. Gur reviya û dî ber devi ya ku Hepûnê lê mexel ketübû, wek birûsk derbas bû. Ew bî qeweta lîngan û cıwaniya xwe xîlas bû. Lî rebenê Hepûnê ket dev û dîranêñ kûçikêñ har û din. Wan, ew jî haleki xîstîn haleki din û çûn. Rebenê Hepûnê dî cihê xwe de dîkîr kaze kaz û ûrin. Lî bêfeyde bû.

Disa rojeki jî rojan dit ku, waye şopek tê. Baş mêze kîr, ku gureki din e. Ew jî cıwan û çeleng e. Wi jî sîlav lê kîr, lî hal û demê wi pîrsi, paşê nas kîr ku Hepûnê bî nav û deng e, pîr kîfa wi hat û got:

-Bêje apê Hepûnê! Ez karîm jî bo te çî bîkim? Te çî dîbê?

Hepûnê:

Xorto! Wek ku tu ji dîbini ez nexwes, bîrindar û bîrçi me.

Gurê cıwan:


- Baş e apê Hepûnê, tu lî vir be ez ê niha bêm.

Çaxa Gurê cıwan bî rî ket, Hepûnê gazi kîr û got:

- Xorto, heger pîrs ne eyb be gelo tu jî kijan qulê û kijan dîlê yi?

Gurê cıwan:

- Ez jî qula nezûr û dêla şin im.



Xort bî rî ket û çû. Dû re Hepûnê ket xem û xîyalan û fîkıri, ku pîr derbêñ bav û kalê vi xorti hebûne. Û jî ber vê yekê hêvi dîkîr, ku ev xort ji wek wan be.

Gurê cıwan baş zânibû, ku bê zîrar wê çawa berateki çêke. Wi tu cari êrişi ser keriki nedikir. Xwe vedîşart û çaxa hîn gisk, mih an kar jî keriyê xwe dîman an ji dîteriqin, ew dîgirtin. Vê carê ji weha kîr, 2-3 gewde ani û dani ber apê xwe Hepûnê. Pıştı Hepûnê têr xwar, bîrinêñ wi ji alast û rehet kîr. Hepûnê rojêñ xwe yêñ dawi dî xweşiyê da derbas kîr. Û şireta wi jî cîvata wi re ev bû: "Heger kesêñ bî his û aqîl dî nav me de pîr bûna, ew ê navê me ne har bûya.

91.10.20

**Barino**

# Weşanê Nû

1

**Navê pirtûkê:**

"KURDISTAN"  
(Rojnama Kurdi ya  
pêşin, ku dî navbera  
salên 1898-1902'an  
da li Mîsîrê ji ali  
Miqdad Midhet Be-  
dîrxan va hatiye  
weşandin).

**Wergêr ji tipê  
Erebi bo tipê  
latini:** M. Emin  
Bozarslan

**Weşanxane:** Weşanxana Deng, Cild I-II,  
Swêd, 1991

**Naverok :** 26 hejmarên rojnameya  
"Kurdistan" ên orijinal bî wergêra tipê latini  
(ji tipê Erebi), bî du cildêن xweşik û tekûz ji  
nû va hatiye weşandin.

Jî nû va çapkırına hejmarên rojnama  
"Kurdistan", layiqê hemû pesnêن hêja ye. M.  
Emin Bozarslan bî xebatek dûr û dirêj, hemû  
nivisarêن rojnameyê ji tipê Erebi wergêrandiye  
tipê latini. Lî gor agahdariya M.E.Bozarslan,  
31 hejmarên "Kurdistan" derçûne û ji 31 hejmaran  
26 hejmar hatine ditin û tevi orijinalêن wê  
di van cildan da hatine çapkırın.

106 rûpelên cilda yekem, ji pêşnîvisara  
M.E.B. bî xwe pêk tê. Dî vê pêşnîvisarê da li  
ser rojnameya "Kurdistan" agahdariyên gelem-  
peri, li ser naveroka rojnameyê û nasandina  
çapa nû pêşkêsiyeke dewlemed û hêja cih  
girtiye. Pêşkêsi him bi zimanê Tirkî him ji bi  
Kurdi ye.



2

**Navê pirtûkê :**  
"Kîlam û Stranê Kur-  
di"

**Amadekar :** Meh-  
met Bayrak

**Weşanxane :** Öz-  
Ge, Ankara, 1991

**Naverok :** Li ser  
muzika Kurdi lêkolin û  
antolojiya stranêن

Kurdi.

84 rûpelên vê pirtûkê cih dide lêkolin,  
guftûgo, hevpeyvin û nivisarên ser muzika Kur-  
di. Dî van nivisaran da siyaseta helandinê (asi-  
milasyon) ya ser muzik û çanda Kurdi, sistema  
stranên Kurdi (ji Nûra Cewari), hevpeyvin bî  
stranbêjên Kurd ên navdar ra, legerina stranên  
Kurdi dî muzika Tirkî da û hwd. têن pêşkêş-  
kirin. 216 rûpelên mayi, ji 208 kîlam, stran û  
lawijêن Kurdi pêk tê. Beşek ji van stranan tevi  
notayêن muzikê hatine pêşkêşkirin.

3

**Navê pirtûkê:**

"VII-X. Yüzyıllarda  
KÜRTLER" (Di Sedsa-  
lên 7-10'an da Kurd)

**Nîvîskar :** Arşak  
Poladyan

**Wergêr bo zimanê  
Tirkî :** Mehmet Demir

**Weşanxane :** Öz-  
Ge, Ankara, 1991

**Naverok :** Lî ser  
bingeha serçaviyêن di-  
roknaş û erdnigarinasêن Ereban, beşek ji diroka  
gelê Kurd tê rawekirin. Anglo di zemanê xelife-  
tiya Ereban da şerê navbera eşirên Kurd û Ere-  
ban, koçen Kurdan û heta qebûlkirina ola islami  
di vê pirtûkê da derîe ronahiyê.

Ev berhem, derheqa jiyan, din, erdnigari,  
eşirên Kurd da gelek agahdariyên diroki yên  
hêja dide û rewşa Kur-  
dan a navbera sedsalên  
7 û 10'an rawe dike.  
Pirtûk ji 112 rûpelan  
pêk hatiye.

4

**Navê pirtûkê :**  
"Çend Rûpel ji Diroka  
Gelê Kurd"

**Nîvîskar :** Dr. K.  
Mezher Ehmed

VII-X. YÜZYILLARDA  
**KÜRTLER**

ARSAK POLADYAN



DR. K. Mezher Ehmed

**ÇEND RÛPEL  
JI DİROKA  
GELÊ KURD**

Wergêr: Elişer

STOCKHOLM 1991

**Wergêr bî zaravê Kurmanci :** Elişer  
**Weşanxane:** Apec-Tryck och Förlag, Stock-

holm, 1991

**Naverok:** Jî şanzdeh mijarên diroki yên derheqa Kurd û Kurdistanê pêk tê. Dî vê berhemê da lî ser diroka şaristani (medeniyet), zimanê Kurdi, "Şerefname"-ya Şerefxan, serhildanê mezin ên Kurdistanê û karekterên wan, çapemeniya Kurdi, edebiyat, belgeyên lî ser diroka Kurdistanê û gelek mijarên mayin têne pêşkêş kîrin.

Pirtûk jî 274 rûpelan pêk tê û bî awayeki cihê diroka Kurd û Kurdistanê cardin radixe ber çavê xwendekaran.

5

**Navê pirtûkê:** "Rojek jî Rojê Evdalê Zeynîkê", Roman

**Niviskar :** Mehmet Uzun

**Weşanxane :** Weşanê Welat, Stockholm, 1991

**Naverok :** Beşek jî jiyan û serpêhatiyê dengbêjê Kurd ê efsanewi û bî rûmet EVDALÊ ZEYNIKÊ, wek roman hatiye nîvisandîn. Dî gel jiyan û serpêhatiyê Evdalê Zeynîkê hin bûyer, tote û edetên Kurdis-tanê, jiyanâ eşiri û serhatiyê wek dîn hatine pêşandan.

6

**Navê pirtûkê :** "Kürtçe Grameri" Kurmanci Lehçesi (Gramera Kurdi)

**Niviskar :** Emir Celadet Eli Bedirxan û Roger Lescot

**Weşanxane :** Institut Kurde De Paris, Fransa, 1990

**Naverok :** Wek jî navê pirtûkê ji tê xuyan, bingeha rîzimanê Kurdi yê zaravayê Kurmanci hatiye pêşkêşkirin.

Ev xebat 20 salê Çeladet Eli Bedirxan stendiye. Dî warê gramera zimanê Kurdi da, otoriteyeke bingehin e û bî saya xebata vi zimanzan û edebiyatnasê bî rûmet, ziman û edebiyata Kurdi ya nîviski gihiştîye hevdemiyê.

Gramera C. Bedirxan dî kovara Hawarê da hatîbû weşandin. Dî wê navberê da, C. Bedirxan û Roger Lescot hevdu li Sûriyê dinasîn. Piştre Roger Lescot vê berhemê werdigerine zimanê Fransizi. Ev xebat şirik, jî ber mirina C. Bedirxan temam nabe û demek

dûr û dirêj bî wi awayi dimine. Roger Lescot, cardin gramerê raçav dîke, kemasîyê mayin temam dîke û jî bo vejandina giyanê C. Bedirxan vê berhemê, bî navê "Grammaire Kurde" (Dialecte Kurmandji) di sala 1970 da dîde weşandin.

Par ji, ev berhem bî zimanê Kurdi-Türkî ji ali weşanxana İnstituya Kurd a Parisê cardin hate weşandin û bî vi awayi jî bo xwendekarê Kurdistan û Trkiye xizmetek hêja bî cih ani.

7

**Navê Pirtûkê :**  
"Gülümse Ey Dersim"  
(Bikene Ey Dersim) -  
Roman, Cild II,  
Rûp:460

**Niviskar :** Münzûr Çem

**Weşanxane :**  
Weşanê Riya Azadi.

**Naverok :** Münzûr Çem di cilda yekem a berya viya da, jî sala 1930 heta 1937, bûyerên siyasi û şerê navberê gelê Kurd ê Dersimê û dewleta Türk anibû ziman.

Dî cilda 2'an da ji, qirkirina gelê kurd a 1938 hatiye nîvisandîn. Niviskar mijarê vê romanê, jî bûyerên rasti wergirtiye. Ew bî xwe ji hêla Dersimê ye û cih bî cih, jî bo amadekirina vê berhemê materyal berev kiriye, bî kesen ku wan bûyeran jiyanê ra hevpeyvin kiriye û nav bî nav deverên şer kifş kiriye. Navê gund, dever, geli, çiya û kaniyê romanê, navên rasti ne. Û herweha piraniya navên qehremanê romanê ji, nehatine guhartin.

Xebata Munzur Çem bî van herdu cildan kuta nabe. Cilda sisîyan ji lî ber çapê ye. Ev romana diroki û belgekiri, jî bo lêkolinvan û xwendekarê Kurd û Türk çavkaniyeke hêja ye.

8

**Navê pirtûkê:** BAWERI

**Niviskar:** Ahmedê HEPO

**Weşanxane:** Azerneşir, Bakû, 1990, 116 pûpel.


**Naverok:** Pirtûka nîviskarê Kurd Ahmedê Hepo, jî serhatiyeke dirêj û jî çend biranînê kurt pêk tê. Mêrxasiya jineke kurd bî navê Hezare, û jiyanâ eşirên Kurd babeta pirtûkê ya serke ye. Kesen ku bî alfabe Kurdi-Kirili dizanîn, dîkarin vê xebata hêja bî hewasiyeke mezin bixwinin.



EMIR CELADET BEDİR XAN  
&  
ROGER LESCOT

KÜRTÇE GRAMERİ  
(Kurmanci Lehçesi)

BİBLİOTÈQUE DE PARIS  
1990



BIHA: 10 Skr